


Şahînê Bekirê Soreklî

# JANA HEFT SALAN



Enstituya Kurdî ya Brukselê

Avec le soutien du Ministère de la Communauté Française –  
Service d'Éducation Permanente

Şahîne Bekirê Soreklî

# JANA HEFT SALAN

Enstituya Kurdî ya Brukselê

çiri 1990

D/1990/5799/1

© Enstitya Kurdî ya Brukselê

4, rue Bonneels, 1040 Bruxelles

tel. 02/230.89.30

çapxane : Acco - Leuven

## P Ê Ş G O T I N

Bo gelê Kurd helbestan her dem roleke mezin lîztiye. Ger di stranan de, ger di xwendina mewlûdê de, ger di qulwerk û çîrokan de, her dem helbest hatine bihîstin. Zarokên gundiyan û yên koçeran ji rojên xwe yên yekem de guhdarî helbestan dikin. Herweha jina Kurd zarokên xwe bi helbestan dike xew. Şivan, gavan û cotkarê Kurd bi stranan demê xwe derbas dikin,... Bi sedan sal gelê Kurd çanda xwe û toreyên xwe bi stran û çîrokan derbasî nifşên li pêş kiriye.

Hezar car mixabin, ji ber bindestbûnê û cîhgirtina asimîlasyon û zordariyê di sedsala 20 an de gellek stran û helbest û çîrokên me wenda bûne.

Dû destpêkirina şoreşê li başûrê Kurdistanê û dû gihîştina Ewropa ya bi sed hezaran Kurd rola helbestan xwe gîhand koçeke nû. Gellek kesên welatperwer ne tenê dikaribûn helbestên helbestvan û hozanên me yên kevnar û nûjen bixwînin, lê bi xwe jî dest pê kirin helbestan binivîsin. Herweha dengbêjên niştîmanperwer rola xwe lîztin û bi deng û mûzîka xwe helbest bo gel xwendin.

Ez yek bûm ji ewên di salên 60î de xwe gîhandin Ewropa. Wek endamekî rêxistineke Kurd, min dizanîbû Kurdî bixwînim, lê xwendineke bi sînor. Li Ewropa min dest bi xwendina hin pirtûkan kir û dûvre li Australya ji dest hat der ez zanibûna xwe li ser zimanê zikmakî hê pêşve bibim. Ber ez bi Kurdî binivîsînim min gotar, helbest û çîrok bi zimanên Ingilîzî, Erebî û Alemani

nivîsandibûn. Di sala 1980 de min dest bi nivîsandina hin helbestan kir, yan belkî di 1979 an de, lê pirraniya van helbestên xwe min dûvre çirrandin, ji lewra di nivîsandina wan de min ne tenê razeke (teqlîd) hin helbestvanan kiribû, lê herweha felsefa wan helbestan xam bû, felsefeyeke biyanî bû, felsefeya zarokên lîseyan û pirtûkên şoreşên welatên din bû. Pirraniya helbestên li pêş di sala 1986an û 87an de hatine nivîsandin. Min hewl da, ku ez metodekî nû di gellek helbestên xwe de wînim holê, ne tenê ji hêla xwebêj û li hevsiwarkirina peyvokan de, lê herweha ji hêla tiştê ku helbest li ser têye nivîsandin de. Ez bixwazim, nexwazim, dûrbûna ji welêt, salên bi janê avis, rola xwe li vir lîztine. Ez beşekî pîrr kurt ji dema xwe di nivîsandina helbestan de derbas dikim. Dema ez helbestekê dinivîsînim, ew daxwaz ji kûraniya dilê min tê der û wisa ez şahiyê bi nivîsandina wê helbestê ji xwe re tînim holê û ez dikarim bêjim, ew helbest ya min e.

Ez nivîsandina bi zimanê Kurdî bo xwe wek pêwîstîyekê dibînim, loma û ji dest hindikbûna dema vala ez êdî pîrr hindik bi zimanên din dinivîsînim. Hemî nivîsên min ji Kurdên roja îroj bêtir, bo yên sibe pêşkêş in.

Mixabin rola ku nivîskarê Kurd di jîyana pirraniya gelê xwe de dilîze bi sînor e, ji lewra pirraniya gel ne dizane bixwîne, bi taybetî bi Kurdî. Li milê din sedemên din yên bi rêxistinên Kurd de girêdayî jî hene. Hêviya min ya mezin ew e, ku fêrkirina zimanê me li welêt pêşve here, bo nivîskarê Kurd xwe bighîne dil û mêjiyê merovê Kurd.

Pirraniya helbestên li pêş divabûn berî demekê di bin navê BANG de hatibûna weşandin, lê mixabin wisa nebû. Hêvîdar im ev pirtûka helbestan di bin navê JANA HEFT SALAN de dilopeke din têxe ser deryaya çanda netewa Kurd.

Ş.B. SOREKLÎ  
Nîsan, 88

## JANA HEFT SALAN

Jana heft salan ji kûraniya hebûna wî,  
weke dilopên xaniyên gundên me,  
dilop-dilop di tasekê de li hev civiyan.  
Jana heft salan ji navenda merovatiya wî,  
weke şîrê bêrîvanên welatê me,  
di beroşê de germ, sar, û hêvan bû,  
di meşkê de hat kilandin,  
û di berbanga sibê de bû rûnê nivîşkîn.  
Jana heft salan di mêjîyê wî re derbas bû,  
û çawa berfa çîyan di destpêka biharê de  
dibe av, xwe beradide binaniya kaşan  
û li şûnekê di çavîyekê re der dibe;  
jana du hezar û pênc sed û pênce û pênc rojan,  
ew jî heliya, weke ava zelal der bû  
û bêjeyên rengîn, hawar û bangê rijandin rûpelan.  
Jana heft salan di hindirê wî de,  
weke daniyên di sîtilan de têtên kelandin,  
li ser palasan têtên raxistin  
û di curnan de têtên kutandin;  
ew jî di hindirê wî de keliyan,  
li ser kaxezan hatin raxistin,  
bo di serîyan de werin kutandin.  
Jana heft salan xem û kederên pilingê Bengalê ne,  
ku li Londerê xistin qefesan;  
nalîna şêrê Kînya ye, ku brîn kirin bi kevanan;  
xwendina kewokê Agirî ye, ku frotine bajarvaniyan;



kûrîniya zarokên Efrîqa ye, ku li Emerîka bûn koleyên  
salan.

Jana heft salan beşekî jiyana wî ye,  
têde hene bêjeyên weke zeytûnên Kurdaxe :  
hişk û tal in li ser darê,  
lê ger di kûp de ketin avê,  
nerm û şorlaq dibin dû çaxê;  
bêjeyên di pirtûkan de ê bigihên nifşê tê :  
Hûn in hêviya me, hûn, û ger hebe, hûn in hebûna me;  
li stûyê we ye bezeyê me, û bona xatirê bapîran :  
**BIBIN KURDÊN PÊŞVERÛ** (ne pêşverûyên Kurd)  
û vexwin ji tasê dilopên janê,  
bo were bîra we, bo ji bîr ranekin :  
**KURDAYETÎ** ye hêvanê mastê netewa we,  
û tenê ulbika mastê we ye,  
ku li sûkan bo we şûnekê dide.

Xort û Keçino :  
pêşyan bo me, me jî bo we, hîştîye jan;  
bila hûn bo yên li dû xwe bihêlin jiyân,  
serbilindiyeke di cîhanê de  
û roj û salên bê êş û jan !  
Jana heft salan pêşkêş e bo netewa me,  
bo Kurdên dilpak, bo keç û xortên ciwan,  
ku bawer dikin bi hebûna me,  
bi serxwebûna Kurdistaneke gewre.

1987

## BANG

Bang, bang, milletê min, bang;  
Hawar, ey gelê min;  
Bang, bang, milletê min;  
Ey gelê min bang !

Nê bîra we şikeftan de  
Bûk û zarok şewitandin;  
camêrên Kurd êsîr birin,  
Li ber çavan darde kirin;  
Ey gelê min, ey !

Nê bîra we, malên Kurdan  
Bi hezaran barkirin dan;  
Welatê me belav kirin;  
Kurdistan tev veşar kirin;  
Ey gelê min, ey !

Çavên xwe vekin, mêze kin :  
Em merov in, lê em seg in ?!  
Çima dijmin li me dixê;  
Xwûna gelê me vedi\we;  
Ey gelê min, ey ?!

Çima bo me nîye ziman,  
ne rojname, ne dibistan;  
Leşker her tum li dû me ne,  
Cendirme tum hember me ne;  
Ey gelê min, ey ?!

Bang, bang, gelê Kurdan, bang !  
Namûs kete binê lingan, bang !  
Bang, bang, milletê min, bang !  
Namûs kete binê lingan, bang !  
Rabin, roja zer bang dike, bang !  
Rabin, Kurdistan diqîre, bang !  
Destan bidin hev gelê min, bang !

1980

## HEVALÊ

Lê hevalê loman meke,  
dilê xwe ji min sar meke;  
kulên dilê min pirr kûr in,  
tixtor ji wana fêm nake,  
Hevalê !

Tu ciwan û pirr çeleng î,  
bejin zirav û xweş reng î;  
şahî û rindî j' te dibarin;

tu xwûn germ î, zelal deng î,  
Delalê !

Hevalê, xerîbî dijwar e;  
ji welêt dûr, yek bê war e.  
Dikim nakim rê bibînim,  
lê gelê min ji bîr nare,  
Hevalê !

Welatê me tar û mar e,  
şênîyê xwe kûr dinale;  
ne heval û ne hogir e;  
girî û keser, qîr û qar e,  
Delalê !

Rêya welatê min dûr e,  
dijmin li ser zor istûr e;  
îroj li vir bêgane me;  
ger ne kenim, dil sar meke,  
Hevalê !

1986

## QÎRÎNA ME

Berde yadê; ez ê herime çol û kerbelan;  
Êdî ne ka'm rakim ev barê giran;  
Naxwazim rûnim li gel dîn û dîwanan.

Hele mêze ke li ev leşker û cendirman,  
Çawa qelew bûne bi dizîna nanê fiqaran,  
Çito serxweş bûne bi vexwarina xwûna Kurdan !

Yadê, em çima bi saxî ketine goran e ?!  
Qîrîn û nalîna me rabûna ezmanê heftan e;  
Ne xwedê dibihîse, ne cîhan dikişîne xeman e.

Lê rebenê, dayê, tu qe nabihîsî dengê bomban,  
Dibarine dîsa li ser kaş û bajar û gundan !  
Hele binihêr li faşîstan, çawa dimijine xwûna Kurdan !

Wax li min dayê, em ketine destên bindestan;  
Bûne koleyên nezan û rûreş û kevneperestan;  
Heta bi kinc û navên bapîran be li me kirine neman !

Ax lê dayê, welatê me bûye axûrê nezan û noker û  
dizan e;  
Ev cîhana îroj bûye şikefta derewçîn û bêbext û xwûnrê-  
jan e;  
Şîr helal ke, bo jîyanê ez mirinê didîme ber çavan e.

Li bakurê welêt dîsa Kurd rabûye, bûye ar e;  
Li başûr û rohilat qama xwe kişandiye, paş ve na re;  
Têkoşîn bo Kurd û Kurdistanê ji bokan re bûye xweş  
kar e.

Tu ji min re silav ke xortên Diyarbekrê, yên Hewlêr û  
Musilê;  
Maç ke çavên têkoşerên Mehebadê; bêje wan roya me ê  
hilê;  
Ji Cezîrê here Kobanî û Efrînê, bila ava yeketîyê bo me  
bikelê.

1983

## WELATÊ ME YE KURDISTAN

Ey hûn gelê xûşk û biran,  
Rabin ser xwe wekî şêran !  
Bes e azepî û bindestî;  
Bijî azadî û serbestî !

Ey hûn gelê Kurdistanê,  
Dengê xwe rakin cîhanê;  
Wek piling herin meydanê;  
Dijmin biratî nizanê.

Ey hûn xort û keçên ciwan;  
Koma rêncber û cotkaran,  
Hele j'xwe pirs kin, hûn kî ne;  
Ji bo çi xas û birçî ne ?!

Kawa bavê min û we ye;  
Dijmin ne birayê me ye.  
Hezar sal xwazt me biratî,  
Lê ji wan rindî ne hatî.

Em in Kurd in, pîrr dilpak in,  
Lê neyar vê rê fêm nakin.  
Werin ala rengîn rakin,  
Kurdistana xwe rizgar kin !

Xakê me ye ev Kurdistan,  
Bi kaş û bajar û gundan.  
Pêşmergên me wane têne,  
Gumme-gum ji çîyan.

1981

## DAYKA RONEĐĪ

Bigrî yadê, tu xemgîn î;  
Bigrî, bibarîn hêsrân.  
Te xêr ne dît ji salên xwe,  
Ey reben, dayka sêwiyan.

T'ew xwedî kirin, ber anîn,  
Pêşkêş kir bo wan jîyan.  
Ha wane zarok mezin bûn;  
Kes ji wan ne bû sermiyan.

Bihar ji bo te dereng ma,  
Pirr dirêj kir zivistan;  
Cem te li mal tum şev reş ma,  
Tu ma birçî û perîşan.

Bigrî dayê, tu xemgîn î;  
Bigrî, bikarîn hêsrân.  
Zarokên te vegehiyan,  
Çavên te li rê qetiyan.

1980



## EVÎNA KEVIN

Bêrîvanê, keça çeleng û dengxweşê;  
Xwûn şêrînê, bejin ziravê, çav reşê !  
Ez bêwar im, îroj bê kes im, dilşîn im;  
Bê xwedî me, ez derdkêş im, ji te dûr im.

Bêrîvanê, tu bi mal î, bi eşîr î;  
Bi hezaran kîlometir ji min dûr î.  
Tu dane mêr, min jî jin kir; ez li vir im, tu li wir î,  
Lê dîsa jî bi şev û roj dilê min bo te digirî.

1980

## KAMPA NAV QÛMÊ

Digerim li dengekî  
ku li Nazê bipirse;  
ev keçika çar salîn  
çima wisa bi tirs e.

Cîhan Nazê nabîne,  
kesek xeman nak'şîne;  
keçeke gelê Kurd e,  
jiyan lê bûye şîn e.

Li derve şev tarî ye,  
Nazê ji xew rabûye,  
nikare êdî razê;  
dayik jî hê payî ye.

Yadê, rabe min rake !  
Şûna em lê ne çak e.  
Me vegeerîn zozanan,  
kincên rengîn li me ke !

Nazê, dayik bi gorî !  
Tu l' zozanan digerî ?!  
şahî l' me bû qedexê,  
bar'yan bombên kîmawî.

Kanî bavê min. dayê;  
ka bra û hevalên min ?  
Li ev şûna tijî qûm  
ez û te va çî dikin ?!

Naza min, şîrîna min !  
Neyêr em revandine;  
Brayên te pêşmerge.  
bavê te jî girtine.

Çima gulan bê gul e,  
çima jiyan bê dil e ?!  
Kesek li vir nakene;  
ne kevok, ne bulbule.

Ez bi qurban, keça min,  
sebra min, hêviya min !  
Hovan em talan kirin,  
ji welêt sirgûn kirin.

Kurdistan, em bi gorî,  
ji Baneh ta Agirî !  
Ta em te rizgar nekin,  
berdewame şîn-girî.

## VII-87

### KENÊ LI SER BÎRÊ

Rind têye bîra min, li ser bîra gund  
ji navîna lêvan kenek te da min.  
Te heland dilê min bi kenê şêrîn;  
wey li min nezal, wey, ez çûm û hatim.

Çavên te yên belek li ber çavên min,  
ev bîst û sê sal in, mane qe narin.  
Evîna min û te wek şeraba sor  
salek li dû ya din hev çêtir digre.

Salên dûr û dirêj, warên ji hev dûr  
evîna nixamtî bêtir kirin kûr.  
Ta bi navên me bin divêt em nebên,  
lê d' kûraniya dil de em bang hev dikin.

Bîst û sê salên din, em ê pîr bibin;  
heye ku em bimrin, yan hev nebînin;  
bila tu zanibî, gulla çavê min,  
kenê te diyar kir tev min çû gorê.

I-88

## BIHARA GUNDÊ ME

Gundê me gundekî çûk e,  
zivistanê serma û pûk e,  
şev dirêj e, roje kurt e;  
lê biharê were, zû ke :  
Bihar, bihara dilanê,  
şahiya xort û keçanê, biharê.

Bihar, bihar, de zû were,  
bila baran pîrr bibare,  
av di golan de weş rabe,  
dilên şivanan pê şa be.  
Bihar, bihara dilanê,  
şahiya xort û keçanê, biharê.

Biharê wîne xêr û bêr,  
gîha pîrr be ji bo dewêr;  
mezin ke berx û karên me;  
dostan şa ke, dûr ve neyêr.  
Bihar, bihara dilanê,  
şahiya xort û keçanê, biharê.

Biharê, li dû tê havîn,  
dilên ciwanan bi evîn,  
dawî têye êdî pale,  
berên cotkaran li mal e.  
Bihar, bihara dilanê,  
şahiya xort û keçanê, biharê.

Payîz jî tê dû havînê,  
evîndaran li hev tînê.  
De biharê zû ke, zû ke,  
li benda te zava û bûk e.  
Bihar, bihara dilanê,  
şahiya xort û keçanê, biharê.

1987

## DELALÊ-XANIMÊ

Lê delalê, xanimê,  
çav bi kilê, zalimê !  
Bo bejna te bûme şivan,  
kenekî bide minê.  
Lê, lê, lê, lê Xanimê !

Esmer Xanim, şêrînê,  
çawa min dihelînî;  
rehmê têxe dilê xwe, lê,  
ramûsankê bid' minê.  
Lê, lê, ...

Xanim li rêya mal e,  
di lingan de şekal e;  
çiqa xweşik xwe l'ba dike,  
dil li ber nale, nale.  
Lê, lê, ...

Keç Xanima gundanê !  
Sozê te da min kanê ?  
Ez ê biçime Amedê,  
nakim êdî şivanî.  
Lê, lê, lê, lê Xanimê,  
lê bêbextê, Xanimê.

1987

## KUJTINA QAMÎŞLOKÊ

Payîz li mal, şev e reş e;  
pênc xortên Kurd û keçekê  
bi mêvanî li gundekî rûniştine.  
Dil bi agir, bi ax û keser  
li ser rojên reş û tarî dipeyivine.

Ji wê hêla şivên hêsin,  
yên welatek çirrandine,  
nokerek caş leşkerên dijmin pêş tîne.  
Leşker, ne esker, laşker in,  
wek gurên birçî û har in,  
di şevreşiyê de li xwûna Kurd digerine.

Dema têne berê derî  
jinek gundî dibêje wan :  
Hawar, me kin,  
di hindir de zarok hene.  
"Hê, hê, ev rebena çîqa dîn e !  
Qe ne dinase em kî ne !  
Leşkerên Tirk in, keçê em;  
Xwûn divêt bo me, em tî ne.  
Em xwûnrêj in, bo em bijîn,  
zarûzêçan em dikujin.  
Bo serê Kurdan ra ne be,  
tum bikujin divêt em we".

Û bombe dibarin,  
xanî tê \ar;  
xwûn dirije,  
qîrîn û hawar.  
Mêr û jin,  
pîr û kal di gel mindal  
dişewitin, dimirin.  
Panzde laşên Kurdan  
bi destên faşistan,  
bi bombeyên Nato,  
tifingên Emerîkan  
Kujtina Qamîşlokê,  
têne kujtin,  
têne birajtin.

Haho, haho, ey hawar !  
Dijmin serdest, weqa har !  
Ey cîhan, ey cîhan, çima deng nakî;  
Li Kurdan çi dibe û nabe, sêrî ra nakî ?!  
Ey \wedê, ey \wedê, çima bê deng î ?  
Belengaz bangî te dikin,  
lê tu jî tişteki na kî.

1981



## REYBER

Guh baş bidin vê çîrokê  
bo bîr nekin hûn vê yekê :  
yê bo neyar bibin rêber  
ê poşman bibin rojekê.  
Reyber, Reyber, reben Reyber,  
bûyî rêber, serî da ser.

Reyber ji bîr kir nan û xwê,  
bû serhevdeya gelê xwe;  
li ser nên kujt Eliyê Şêr,  
xwe arzan firote neyêr.  
Reyber, Reyber ...

Şûya Elî Zerîfe bû,  
weke şêran li ser xwe bû;  
şeşar rakir avêt Reyber  
lê filitî ji wê noker.  
Reyber, Reyber, ...  
Reyber du serî rakirin,  
bo bînbaşîyekî birin;  
xwazt serdaran razî bike,  
lê wana tife rû kirin.  
Reyber, Reyber, ...

Bînbaşî got : ey Reybero,  
tu bo gelê xwe nokero;  
ger te Kurd firotin arzan,  
tu çi dikî bo me Tirkan ?!  
Reyber, Reyber, ...

Çav girê dan, dan ber gulan,  
laş berate li ber ligan :  
Reyber bû dersek dîrokê  
bo kesên noker û nezan.  
Reyber, Reyber, ...

Ev serpêhatîya Reyber  
şoreşa Dêrsim tîne ber :  
kurmê darê ji darê bû,  
bi hezaran Kurd çûn ji ber.  
Reyber, Reyber, ...

Reyber bêtirs û fêde bû,  
lê kurmikê dara xwe bû :  
yê xêrê neke li yên xwe,  
bo kesên din nabe malxwe.  
Reyber, Reyber, ...

XII-87

## JINA KURD !

Te dihêlin bê vwendin,  
Te difroşin wekî dewar,  
Te ji serbestî dûr dixin,  
Rojan li te dikin êvar.  
Bi şîretên wan nezanan  
Peya l' ser te kirin şivan.  
Divêt hûn jî êdî rabin;  
Welat bê jinan şên na bin.  
Gelek wekî bedenekê,  
Bi du destan ew kar dikê.  
Jin yek ji wan her du destan;  
Ew êş dike civakekê.

1980

## COTKAR !

Lo cotkaro, cotkaro,  
Hêvîdaro, hevalo !  
Ro hilat waye bihar e,  
Lê li cem te şeva ser e.  
Bi roj û meh û bi salan  
Te tum kirin karên giran;  
Te ne dîtî rojên bi ken,  
Jîyîn domand bi av û nan.  
Bira û pismamên te j' gund çûn.

Li bajaran bûne karker,  
Lê ya wan jî bi ser ne ket;  
Li wir jî ew perîşan bûn.  
Ger tu cotkar, ger tu karker;  
Ger tu şofêr, ger tu berber;  
Çi dibî bibe, ger Kurd î,  
Bo welat bibe kurdperwer.  
Ger Kurdistan rizgar ne be,  
Gelê me jî azad ne be;  
Çare nîye bo me, kekê;  
Dijmin ê tum li ser me be.

1980

## JÎYÎNA GUND

Nîsan çûye, ev gulan e;  
Zad rabûne ser çongan e;  
Gundî hemî li ser lingan;  
Dema xebat û karan e.

Xello çûye ber bizinan;  
Fat û Hedlê çûne qirşan;  
Simo û Azad li palê ne;  
Gund vala bûye j' gundîyan.

Ro l' ava ye, gundî têne;  
Zerî û esmer hemî l' rê ne;  
Şorê dikine l' ser xortan;  
Gundê me çi xweş û şên e !

Gavan têye l' dû navirê;  
Eyşo û Zêno li ser bîrê;  
çar zarok jî l' şûn bêderan  
Dilîzine bi zoferê.  
Dê radibe ji nav malan;  
bîna şivan têye pozan;  
Gundî westa û birçî ne;  
Xwarin xweş e li dû karan.

Jîn li gundê me hêsan e;  
Yekcaran jî tiji jan e,  
lê şahîyê dike dilan;  
Gund xemlana Kurdistan e.

1986

## BÛKA MÎDÎYAN

Ez ê rojekê di berbanga sibê de serê xwe rakim,  
Nefesek kûr ji hilm û hilkana bayê şefaqê bikişînim,  
Çavên xwe bi çelengiya te kil kim  
Û dilê xwe bi hebûna te şa kim.  
De hayê, ax li min, hayê;  
Sebra dilê min bê te nayê;  
De hayê, Bûka Mîdîyan, hayê !  
Ez ê di meha gulanê de kulîlkekê ji dara gulan jêkim  
Û bi stirîyên wê xwûna germ ji tilîyên xwe di rê kim,  
Bo xwe bi zik bavêjim erdê,  
Gulê diyarî kim û xweliya bin lingên te maç kim.  
De hayê, delala minê, hayê;  
Sebra dilê min bê te nayê;  
De hayê; Bûka Mîdîyan, hayê !  
Di bin çemelên darên peyamê  
Û di nav reng û bînên mitên biharê de  
Ez ê porê te şe kim,  
Kirasê rengîn bi ser bejin û balava te de berdim;  
Û li ber dengê heft def û zurnan,  
Têlên tenbûrên hunermendan  
Bi hezaran mindalên me  
Ê xwe bo daweta te li bakin.  
De hayê, ax li min hayê;  
Sebra dilê min bê te nayê;  
De hayê Bûka Mîdîyan hayê !  
Ruhên camêran, evîndarên te  
Û yên zerî û esmerên bo te bûnî qurban  
Ji nav kaş û newalan

Û ji ezmanê heftan ê werin xar,  
 Bo serên xwe ji te re daxin;  
 Destên te ji me re hene kin.  
 Bi zilxîtên jinên çeleng;  
 Bi stiranên ciwanan, em ê te dervin;  
 Û bi refan siwarên hespên kihêl  
 Ê te têxin bin qanadên evînê  
 û di bin siya rumên xwe de bigihînin mal;  
 Bo te bibin berdest û te biparêzin.  
 De hayê, ax li min, hayê;  
 Sebra dilê min bê te nayê;  
 De hayê, Bûka Mîdîyan hayê.  
 Em ê wan sindif û merbendên li dû te man î  
 Têxin entîkxaneyan, veşêrin,  
 Bo şevên tarî wînin bîra nîfşên li pêş.  
 Ew xwûna bedena te û canên qurbanên te,  
 Ku bûye beşek ji hesinê zincîran  
 Ê di dîrokê de sondan bi şênîyê te xwarin bide,  
 Ku kesek nema êdî ji dest wan te direvîne  
 Û namûsa wan dike bin lîngan, Çavên wan berdide erdê.  
 Keskesor ê sibe xwe bi ser te de ber din;  
 Ez ê di nav rengên wan yên xweşik de xwe bi te gihînim,  
 Ramûsanekê li ser eniya te çelengê de biçînim;  
 Û ger em merovên çê bin, comerd û zana bin,  
 Em ê bi hebûna te û bo evîna navê te  
 Hêlûnan di bihuştê de çê kin.  
 De hayê, ax li min, hayê;  
 Sebra dilê min bê te nayê;  
 de hayê, Bûka Mîdîyan, ez bi heyranê, hayê !

## KULÛLKA ZER !

Porzerê, çav hêşînê, keça ciwan;  
tu pîrr çeleng û rind î,  
sivik, şêrîn û qenc î,  
lê çi bikim \weşikê;  
nika'm bikim vê yekê;  
dem nîye l' ba min bo evîna dilan.

Ez jî wek te \wendekar bûm rojekê;  
dil ji evînê tiji bû,  
ro kenok, ezman sayî bû;  
dûvre em derketin ji mal,  
firiyan roj, derbas bûn sal;  
nuha l' dawiya cîhanê digertime l' gulekê.

Kulûlka zer, tu \wûn germ î, tiji jîn;  
here biger li kesek din,  
bo min heye mindal û jin;  
xwendegeh bo te li vir e,  
tu dersa \we j' min bigire;  
dilê \we mede mamostan, qe mebe dîn !

Gula min li dûr dimîne, bê bihar;  
çilmisiye, na kene;  
kêm jê dir'je, reben e.  
Ta ku ewa birîn e  
Şahî bo min jî nîne.  
Bibexîşîn porzera gênc, em ne bûn yar !



## GUSTÎRKA BÊ XWEDÎ

Lê de bikene hîvê; stêrkino rabine dîlanê.

Îşev hatîye dawîya eskerîya sê sal û nîvan li Binanê;

Ez ê bi rohilat re berê xwe bidim bajarê Helebê,

Bila li te eyan be, evîna dilê min, Perîşanê.

Li Helebê ez ê xwe bi lez berdim taxa qumçîyan,

Bo bikirim ji delala dilê xwe re gustîrka nîşanê.

Ji wir ez ê berê xwe bidim çemê Ferêt, derbas kim,

Xwe bigihînim deysta Sirûcê, axa Kurdistanê.

Ez ê rojbaşîyê bidim bajarê Kobanî, kaşê Miştênûrê

û xwe ji wir berdim gundê Miktelê, merhebê bidim li

Ava Qinê.

Bi rohilat re ez ê xwe berdim nav gundê Elîşarê

û bigerim li dûyê argûnê te, Perîşana dilê min, Şîrin

canê.

Hawar dilo, bila bişewite mala verîbîyê, birijin çavên  
nezanîyê;

De min çi zanibû, ku Perîşana min dane Hec Ezîzê  
Şêranê.

Bo hişk bikin dara evînê, reşîyê têxin şûna xweşîyê,

Êgir berdî dilên ciwanan û rê bibirin li şahîyê.

Lê pîrê, ez bi heyranê, bi kerema xwe ji min re silav ke  
Perîşana Elê;

Bêje xortekî bi rohilat re hanîbû gustîrkek nîşanê,

Lê xwedîya wê ne dît, keserek kûr kişand û berê xwe  
da kaşên Kurdistanê.

Lê, lê pîrê, tu ji min re van morikan bigihîne Perîşanê;  
Bibêj', ez ji bîr na kim ramûsana ew roja nîsanê.  
Bibêj', min ê ew birevanda, lê na xwazim bibim sedema  
rijandina xwînê.

Min sond xwarîye, ez ê Kurdmancek din ji xwe re ne  
kim dijmin;

Ger hene di nav me de boke, bila hilînin heyfa Kurd û  
Kurdistanê.

1986

## MEROVTIYA ME

Rûdine, peyvên gran jê têne der;  
çi peya ye, çi camêr e, DEVRIMWER !  
"Ez zana me, min wanî kir, ez karker;  
canê xwe didim bo welat, brader".

Bi hezaran kûpên derew û viran  
bûn "şoreşgêrên" gewaze, bê encam;  
rizgar dikin cîhanê di qehwan de,  
sondan dixwin bi navê ew Kurdistan.

Ey welato, bextereş û ronedi !  
Ji dewarê bê şivan dikim fedî;  
merovê Kurd wenda bû ye, bê xwedî;  
bû ye fêlesof û zana her gidî.

Ji derva de pêşverû b' kincên nûjen,  
şorê dike bi çînik, qurm û bi ken,  
lê bi rastî ew kukumek wenda ye,  
bi xewn û xeyalan dijîye reben.

Bapîrên me, ey Mîdîyên qehreman !  
 Hûn dizanin çi bûye îro l' Kurdan ?!  
 Li paş mane, bûne kolên nezanan;  
 bo dilê min sedema derd û kulan.  
 Camêr li nav me îroj zehf hindik in;  
 pirr ji wan nizanin çima şer dikin;  
 em bûne wek mastê hêvan negirtî;  
 gelên din hişyar, barê me hê ketî.  
 Lawo j' kurdayetiya xwe hûn şerm nekin,  
 bo Xwedê jî welatê xwe j' bîr mekin;  
 yên Kurdan in Mehabad û Qamîşlok,  
 her weha yên wan in Amed û Dehok.  
 Bo Kurd divêt yek amanc û yek hebûn;  
 ger birje, bo yek Kurdistan birje xwûn.  
 Bo felat yên nezan û qeşmer nabin;  
 bo kurdayetî dil hemî dê şa bin.  
 Ger yeketî, berê yeke'ya Kurdan;  
 ger bi qurban bin, bibin ya Kurdistan;  
 hez bikin hev, bibin wek xûşk û bran;  
 ew merovtî ye, xebat e bo cîhan.

NII-86

## KARKERA NIJADPEREST

Li paş masê sekinîye,  
wer dizane pirr zane;  
Lê mixabin bê hiş e ew,  
beden qalind lê d' serî de ne\weş e.  
Ji xwe hez dike,  
serbilind e,  
lê ji kesek din hez nake;  
jinek nijadperest e.  
Îroj kukumên şerpeze ji xakên belengazan  
yên bin destên canbazan  
xwe l' welat wê girtine,  
ketine xewnên vala;  
yan "bi mêvanî" karker in,  
biyanîyên bar-raker in.  
Jina qalind e por zer e,  
wer dizane ew cewher e;  
pozbilind e, xwe dixwê ye,  
wel, wel, çiqax we dixwê ye !  
Xortek por-reş ji wê de tê ye,  
xemgîn û dilsar xuya ye;  
belkî wenda ye !  
Ber bi porzerê dihere,  
merov dibê qey dixuşe  
û pirsekê ji wê dipirse,  
lê qalind rû tirş tal dike,  
naxwaze kurik fêhm bike.  
Bi dengêkî nîv şikestî

lawik pirsê duçar dike;  
jinik hê qalintir dibe,  
her du gup sor in, diqîre :  
siktir, herin welatên xwe,  
we bajarê me herimand,  
pîs û pas kir, gemarîn kir;  
ne dizanim hukmata me,  
çima we nake qedexe !  
Erê porzer zehf xeyidî,  
hindik mabû l' wir bibe dîn;  
di dilê xwe da daxwaz dikir  
ku Hitler îroj hê sax ba,  
li ser Aleman serdar ba,  
bo "paqij de" welatê wan  
ji biyanîyên wenda bûnî  
"û ji ewên gemarîn û genî".  
Xort ser nizam bi rê ve çû,  
hezar kul û keser li dû  
û bi xwe ra wisa digot :  
Serbilind di zindanan da,  
yan belengaz di gundan da  
xweştir e j' welatek wisa,  
tê da biyanî bê war e,  
bê heval, bê şahî, bêçare;  
jîyan bê evîn zor sar e !

XII-86

## MEBEST YEK E

Li bakur agir bariya l' ser dijmin,  
Leşkerên cûnta dilreş hatin kujtin;  
li başûr bombe ji ezmên bariyan  
li ser xakî Kurd, welatî bapîran.  
Têkoşerên me dikujin gurên dîn,  
kurên Kemêl bombeyên NATO tînin.  
Bapîrên wan bi singû kujtin zaork,  
ew îroj dikujin bi bombên firok.  
Ey gelê Kurd, yek e, yek e têkoşîn;  
yek welat e, tê de gelek dilbirîn.  
Çavên şehîdan êdî li rê qetiyên,  
kanî enîyek gewre bo Kurdistan ?!  
Ger li bakur, yan li başûr û navîn,  
yek e amanc bo neyarên dev bi xwûn.  
Dixwazin tune kin gel, welatê me;  
me bikin bindest, azep, koleyên xwe.  
Faşîstên sê gelan li ser me bûn yek;  
bo çi em dest nadin hev, xayin felek ?!  
Yek dibê', bimre bûrciwaziya me;  
yê din dibnê', bimre axa û begê me;  
yek dibê', bimrin ew muftî û melle;  
yê din dibê', qomonîst dikin fille;  
yek dibê', pîrr in bo me dost û heval,  
em ê azad kin cîhan ji impiryal !  
Bila bir'jin çavên te, felek, neyar,  
em îroj ketin rewşek axû û jar.

Kuro lawo, yek e mebest bo hemîyan,  
serbestî û azadî bo yek Kurdistan !  
Dema welatê bapîran rizgar be,  
Kurd jî li nav cîhan li ser lingan be,  
em ê rakin jor ew roya Zerdeşt,  
welatê \we bikin bo \we \weş bihuşt.  
Em na \wazin Kurdistanek wek Binan,  
ne jî olperestî wek Afxanistan.  
Ê me divêt welatek bo azadî,  
aşitî û wekhevî û biratî.  
Ger em hemî îroj paqîş kin dilan,  
dirêj kin bo hevûdu bê şert destan;  
ger em \we fêr kin rêzaniya cîhan;  
baş binasin bo \we dijmin û dostan;  
ger em kurdayetiyê têxin pîlan  
û Kurdan nas bikin ber biyanîyan  
dirêj nake, ya me ê bi ser keve.  
ronahî ê zû big're şûna şevê:  
neyar ê bibe dost, noker bireve;  
kesek nikane bêje, ev Kurd hov e.  
Kurdistan bo hinan bû wek qîzekê,  
her kes di\waze d' rêya \we ke keçê,  
bi ya \we ke, bi jina \we ke bûkê.  
Kuro, Kurdistan dayika me ye,  
dil dil de bo hemîyan evîn heye.  
Bes e êdî jîyana rev û \wûnê;  
Bo azadî bi yek kin têkoşînê.

IX-86

## DÎROKÊ BIBE ŞAHDE !

Roya li jor !

Çavên min jî te dibînin.

Ezmano !

Dilê min jî bi kûrbûn û firehiya te şa dibe.

Merovino !

Ez jî wek we merov im, lo;

ji we ne kêmtir im;

ji we ne dîntir im.

Lo, ji min bawer bikin;

bi şîrê dayika \we sond di\wim;

ji min bawer bikin,

gotinên min ne henek in.

Erê, lo !

Zimanê me qedexê kirine wan,

ew karbidestên bê wujdan.

Ez bi merovtiya \we sond di\wim, lo !

Erê, erê,

zimanê me qedexê ye.

Bawer mekin ji peyvokên wan yên rengîn,

rêzkirina bêjeyên derewîn,

ji fen-û-fûtên wan;

pispor in ew bi van tiştan.

Ey kesên ku \we merov dinavînin !

Zimanê me jî ji hebûna merovtiyê zaye,

\wedan çîrok û stran e,

çemê derd û kul û dilşadiya bîst milyonan e.

Qedexê ye, keçê !



Qedexe ye, kuro !  
Qedexe ye zimanê me, qedexe !  
Nahêlên bêjeyên wî têkevin rûpelan,  
dengên wî xwe derbas kin mîkrefonan.  
Dîroka merovtîyê, bibe şahde !  
Zimanek cîhanê  
li paş derîyên hesinî,  
di zêzemîyên tarî de  
bi zincîran girtine,  
bi singû û xenceran  
pergal lê belav kirine;  
zimanek merovan,  
lê hê nekujtine;  
didomîne berxwedan.  
Hov in ewana, ne merov in !  
Ger hebin bi hezaran mizgeftên wan;  
ger vekin hezar û yek zanîngehan;  
ger li ser hîvê jî peyabin,  
dîsa, dîsa hov dimînin.  
Na, na, hov ji wana çêtir in;  
ma kengê hovan zimanek qedexe kirin !!!

I-87

## Ç I M A ?

Çima, çima, bêje çima  
derdê me tenê j' me ra ma ?!  
Çima bo peyak Emêrkî  
dunê radikin, çima, çima;  
bi hezaran Kurd dimirin,  
nakişîne cîhan tu \eman ?!

Mafên gelê Kurd birîn bûn;  
bi milyonan Kurd sirgûn bûn;  
weqa rijiya û hê dirje \wûn,  
lê cîhan hemî bê deng ma.  
Çima, çima, bêje çima  
derdê me tenê j' me ra ma ?!

Me gul rakir, kir destê \we;  
me got fermo, bira Faris, fermo j' te ra.  
Me gul rakir, me pêşkêş kir;  
Me got fermo bira Ereb, fermo j' te ra.  
Me gul rakir û pêşkêş kir;  
Me got kekê Tirko fermo, ev ji te ra.  
Gula me kirin bin lingan,  
qedexe kirin nav û ziman,  
tar û mar kirin Kurdistan.  
Çima, çima bêjin çima  
derdê me tenê j' me ra ma ?!

Birayê min dane kujtin;  
dema giriyam, gotin çima,  
çima digirî, çima, çima ?!  
Ji destên min nan revandin;  
min gazinc kir : ez birçî me.  
Gotin çima dikî gazinc, çima, çima ?!

Bi darê zorê gelê Filistîn derxistin;  
salên dirêj kirin konan, bê maf hîştin.  
Ji Mîrajan, ji Fantoman agir berdan  
nav çadîran, ser zarokan, pîr û kalan.  
Imperyalîstan çav girtin, guhu girtin;  
kesekî j' wan ne got çima !  
Bi dilek xemgîn erebekî j' Filistînê  
tifing rakir; rabû dunê;  
gotin çima bû terorîst, çima, çima ?!  
Li Cezayir, li Vêtnam û Filistînê,  
Li Zimbabwê, li Kurdistanê û Çîlê  
bi milyonan merov kujtin,  
dane girtin, birçî hîştin.  
Imperyalîstan çav girtin, guhu girtin;  
dest û pişt dane wan cûntan  
û qe ne pirsîn, çima hûn wisa har bûne,  
çima xwûnê hûn dir'jînin, çima, çima ?!

Li Filistîn û hemî beşên cîhanê,  
dema gelan gurr kir arê têkoşînê;  
em jî bi wan re dilşa bûn û me bang kir :  
bijî şerê hevalan bo serxwebûnê !

Zimanê me l' Kurdistanê j' me qut kirin,  
bejeya bav û kalên me j' me dûr kirin,  
leşkerên xwe l' welatê me belav kirin,  
girtîgehên xwe j' xortên me tiji kirin  
û li me xistin dema me j' wan re got çima !  
Gotin çima dibê'n çima ?! Me bê'n çima !

Li payitextên Ewropê, li Qahirê, l' New Yorkê  
al radibin, radibin deng;  
axaftin dibin bo gelan, çê dibin ceng,  
lê ji bo Kurdan nake kes qe şorekê.

Wey Kurdino, bê xwedîno; bûye dereng.  
Ji xwe pirs bikin hele carekê, bêjin çima  
tenê l' me bû ev nifira;  
derdê me bo me tenê ma.

Hê gula me d' destê me da;  
em dibêjin, fermo j' we ra !  
Kulîlka me gemarîn me kin;  
ger hûn bikin em ê rabin;  
miçiqî bîra sebrê b' me ra.  
Ger em rabin, xwûna me û we ê birije;  
Impiryalî ê me herduyan bi kevirekî bikuje.  
Bo aşitî û merovtîyê  
em hê j' we ra bi dilek pak dibê'n bira.  
Hûn jî bo me bêjin bira, lê bê derew bêjin : bira;  
ger hûn bêjin, emê hemî bi destekî vêxin çiran.

Înglîzan, Firansîzan, tev li Lozan,  
dû mirina dewleta nisax, ya Osman,  
welat hemî di nav xwe de parve kirin,  
bo xatirê Kemalê Tirk mafên Kurdan tune kirin.  
Stemkariya Tirk û Faris û Ereban  
dawî nayê; em fetisiyan, em fetisiyan, ...

Bapîrên me bi navê olê ew af kirin;  
gotin sibe zarokên me mezin bibin  
ê wekhevî were holê, ew ê hemî bibin bira.  
Sal derbas bûn, dem fertîlî:  
ew tum neyar man bi me ra.

Têye gotin, hinek tînine mizgînê :  
Li Stembolê, li Bêrûtê, l' Filistîne,  
li Helebê, li Tehranê, l' Xaniqînê  
hin hevalên Tirk û Faris û Ereb jî  
bo gelê Kurd destên xwe dan têkoşînê.  
Em dixwazin ew hevalan baş bizanin,  
bo me hogir û yar in ew, ne dijmin in;  
dijminên me û wan şovenên derewçîn in,  
xwediyên sermiyan, dizên derve û hindir in.

Bijî têkoşîna gelan bo azadî û serxwebûnê;  
bila bindest nemîne kes, aşitî were vê dunê !

1980

Ç Ê !

Çê !

Wek navê xwe rind û çê be,  
bo hevalên baş li rê be;  
xwediyê navê xwe be !

Çê !

Di rojên ciwaniya min de  
dîwarek odayên min  
her dem dihat xemilandin  
bi wêneyek merovek mezin,  
wêneya Çê, CHE GUEVARA.  
Wî li dû hîşt jîyana hêsan,  
çû nav kaş û daristanan,  
xwe kir qurban bo ramanên xwe,  
bo jîyaneke xweştir ya xizanan.  
Roja mirina Guevara  
bi destên hovên du-ling;  
li pêş wêneya wî min xwar sond,  
ger rojekê ez bûm bavê lawekî,  
ez ê navê wî lêkim Çê.

Çê !

Dil dixwazt ez te xwedî kim  
û ji rêya Guevara re hêvî kim,  
lê bi rê ve dilê min sar bû ji "şoreşan",  
ji derew û dahf û lehfan,  
ji valabûna sloganan.

Çê !

jîyana bê heval tiji qeram e,  
lê \weştir e ji hevaltiya kesên \irab.  
Ziman-\weş be,  
lê her kesî bo \we meke heval !  
Hindik in, pîrr, pîrr hindik in  
di cîhana me de yarên yar.  
Xwe biparêze ji hevaltiya hevalê bêbext,  
yê ku rojekê bi te re bra ye,  
lê ger ji te \eyidî dibe mar  
û ta roja mirinê \we dide benda te,  
hewl dide xwûna te vexwe,  
jîyana te bike tiji jahr.  
Bila kenê li ser devên maran te nexapîne;  
binase, zor, zor çak binase merovan  
ber tu bi wan re bibî wek bran !

Çê !

Ya te ye rê,  
ew ê bikişe,  
ji hev biqelişe.  
Rêçika \we bi \we bibijêr;  
ger te xwazt bibe şoreşgêr,  
yan olperwer, yan kafir,  
lê şîretek bavê \we bigir :  
Di jîyînê de meke derew û vir !  
Ji xwe bîra meke,  
ger xwedîyê şora \we be kevneperestek,  
bi namûstir e ew ji şoreşgêrek dilreş û virek.

Çê !

Baweriya te çî dibe jî,  
hez bike ji merovtîyê,  
ji hebûnê;  
û têbikoşe li dijî hovitiyê !

Çê !

Li ku dibî bibe,  
li kuderê dijî bijî,  
lê ji min bawer ke,  
xebata bo Kurd û Kurdistanê  
têkoşîn e bo rindîyê,  
jîyana gelek fêde,  
bo hebûnê !

I-87



## EY EHREMAN !

Ey Ehreman, yezdanê gewre,  
Xudayê zivistanê,  
şevên tarî, bahoz û berf û baranê !

Ey serdestê nîvdemê,  
li xakî Kurdistan,  
ey Ehreman !

Wek zinar û polat dilhişk;  
sal bi sal, bi hatina çeyê te re  
dihat birçîbûna belengazan,

nisaxiya mindalan  
û mirina pîr û kalan  
di hindir konên mûyê reş de,  
di şikeftên kaşan de,  
di qubikên gundan de.

Erê, erê, yezdanê nav bilind,  
Ehreman !

TE ro vedişart,

Ji deryan mij dihanî der

û li ezmên belav dikir,

bo ji wî çêbin ewrên dagirtî

û xunaviyê bibarînin,

ya ku ji sermê diqefilî û dibû berf,

bo li ser kaş û newalan

bibe xalîyek qalind

û di bin xwe de bifetisîne mitan.

Erê, erê, Xudayê bapîran,

Ehreman !

Haya min heye ji zordariya TE,  
 ji şîrmaqên \ezeba TE,  
 bi yezdan Hurmuz re dijminiya TE,  
 lê ez dizanim,  
 ez pîrr baş dizanim,  
 TE mirin ne dixwazt bo me,  
 ji lewra li dû şeva reş û tarî  
 her dem ro hildihat  
 û li dû mirinê dîsa bi ser diket jîyan.  
 Ger ne bûya berf û pûka TE,  
 ger ne bûna bahoz û barana TE,  
 Ê ji ku bihata ava çeman,  
 çawa şil bûbûna devikên çaviyan,  
 Ê kê ruh têxista mêrg û kaniyan:  
 û kulîlkên \akê Mîdîyan  
 Ê ji ku bihanîna pelikên rengîn  
 û hilm û hilkana bayê biharê  
 avis bikirana bi bînên weqa \weş û ciwan ?  
 Ey yezdanê mezin,  
 Ehreman !  
 Dilê TE hişk bû,  
 lê her weha dilek pak bû;  
 li dû mirinê rê dida jîyînê.  
 Îroj li Kurdistan  
 şevreşiyê hebûn daqultandiyê:  
 ew tarîbûna zindanên girtîgehan,  
 ya nezani û belengazîyê,  
 ya pêkenîn û talanê  
 tarîbûnek bê hempa ye

û heku dihere tarîtir dibe,  
mirinê ji jîyînê şêrîntir dike.  
Erê, erê, yezdanê dilpak,  
Ehreman !  
Serdestiya te şîr û şekir bû,  
tê de hebû hêvî;  
tarîbûna zivistana te bi mebest bû,  
ne wek ya îroj.  
Dilê min yê bawermend  
dîsa li TE digere;  
TU yê me bû yî,  
Em jî yê TE !  
Xweziya TU dîsa li me vegeriya jî  
û zordariya TE biketa şûna ya van bê bextan !

1986

### QERALÊ PÊRÎYAN +

Kîye siwarê ev şeva tarî, ev bayê qebe ?  
Peyak e li rêya mal, kurê \we li pêş;  
Qewîn girtîye lawik di hembêza \we de,  
Ew parastîye. ew germ hiştîye.

"Kurê min, çima ditirsî, vedişêrî rû ?"  
Ma tu nabînî, bavo, qeralê pêrîyan ?  
Pêrîyê ser bi tac, beden bi xeftan ?  
"Kurê min metirse; ev komek mij e".

"Ez heyran lawo, wer' tev min here !  
Lîztikên \weşik bilîzim bi te re;  
Raber te kim ber çem kulîlkên rengîn;  
Ê l' teke dayka min ew kincên zêrîn".

Lo bavo, lo bavo. ma tu nabihîzî  
Padîşahê pêrîyan ji min re çi d'bêjê ?  
"Hus ke kurê min, bê deng bimîne";  
Ba dike vîze-vîz, pelikan tev tîne".

"Ey tu lawê ciwan, ê tu tev min bê ?  
Qîzên min yên çeleng \we dane benda tê;  
Ê tev te bazdin ew, rabin dîlanê;  
Bi stiranên zor qenc ê te têkin \ew".

Lo bavo, mêzeke li şûna tarî  
çawa sekinîne keçikên pêrî !  
"Kurê min, kurê min, ez baş dibînim;  
Darên qebaxêne ew, gewravîn li ber çav".

"Ji te hez dikim, diecbînim bejna te;  
Kerem ke b'rihetî yan didim zorê".  
Lo bavo, hawar, waye dest avêt min,  
Qeralê pêrîyan êşand canê min !

Bizdoyîn bû bavik hema ji tirsan,  
Li \ar kir hespa \we, kur fikir sikran;  
Çi ji dest hat kir; \we gîhand mala \we,  
Li lêwik niherî, bê ruh mabû can.

+ Johann Wolfgang VON GOETHE (1749-1832)  
Wergerandin ji Almanî : Şahîne SOREKLÎ

## LI XERÎBÎYÊ

Sal derbas bûn, ax lê dayê;  
Nameyên te êdî qut bûn.  
Têlên porê min jî gewr bûn:  
Ez jî bûm dê, vewa m' nayê.

Dara tûyên mor û şêrîn  
Qe j' bîr nabe, şêrîn dayê;  
Girê gundê me li ber çav,  
Ax û keser dawî nayên.

Xwez'ya dîsa zarok bama,  
bê têlvizyon û tirimbêl;  
Tenê j' xerîbî' dûr bama,  
Bê gelê min sebra m' nayê.

Mindal wane mezin dibin,  
Dibêjin kanî pîrka me;  
Ne d' zanim bo wan çi bêjim;  
Ew jî wenda ne, lê dayê !

Ez li dor vwe mêze dikim;  
Dilên xelkê çiqê şa ne.  
Ê me li wir sitemkarî,  
Li vir jî şahî qe nayê.

Yadê mizgînê bide min,  
Bêje bihar waye li pêş;  
Bila hêvî bo me çê be,  
Ken têkeve şûna tayê.

## AX JI DERDÊ VAN BÊBEXTAN

Ji Diyarbekra qehreman  
Têye dengek kûr û giran;  
Nalîna xortan,  
Qîrîna jinan,  
Axe-kufa belengazan; ax,  
Ax ji derdê van xwînrijan,  
Van nezanan, van bêbextan;  
Çiqas paşve mane, ax.

Ji Sowêto ya qehreman  
Têye dengek kûr û giran  
Tiji êş û jan  
Ji derdê dizan;  
Dibin ser û binê erdê; ax,  
Ax .....

Ji Selvedora qehreman  
Têye dengek kûr û giran;  
Faşist har bûne,  
Dirjînin xwînê;  
Ne dizanin mirovtîyê; ax,  
Ax .....

Ji Filistîna qehreman  
Têye dengêk kûr û giran;  
Jinek digrî ye,  
Lawik mirî ye;  
Ew jî wek bavê wî kujtin; ax,  
Ax .....

Ji Mehabada qehreman  
Têye dengêk kûr û giran;  
Mindal sêwî ne;  
Qîrîn û şîn e;  
Bavên mêrxas canfîda bûn; ax,  
Ax .....

Li hemû beşên cîhanê  
Wek gelê me l' Kurdistanê  
Hinek digirîne,  
Birçî û tî ne;  
Hin jî îroj hîn bindest in; ax,  
Ax .....

1984

## KEÇA KURD

Ez guleke rengî me,  
Bêkes im, bê xwedî me;  
Li cîhanê bê nav im ez,  
Fedîkar im, sêwî me.

Ez kewika sipî me,  
Bê qanad im, digrî me;  
Wer azadî dixwazim ku,  
Lê b' zincîran girtî me.

Ez xezalek dilşîn im,  
Kulan ez pîrr dikşînim;  
Nika'm rakim van derdan, lê  
Ez çi bikim, birîn im.

Ez başîqa kaşan im,  
Bê tîrs im, lê \nîzan im;  
Dixwazim ez bifirim, lê  
Birîn kûr e, ne karim.

Ez xemlana gundan im,  
Biharê bêrîvan im;  
Pîrr dixwazim têgihîşt bim, lê  
Paşve mame, nezan im.

Ez bulbula bê deng im,  
Li Kurdistana çeleng im;  
Evîndara serbestî me,  
Lê çi bikim, bi derd im.

1980



## GOTINA RAST

Serjê meke bo min berx, yan jî kara xwe,  
ne pêşkêş ke diyariyên bilind-nerx e !  
Bo min ji merovan divêt gotina rast,  
ji mêrxasan ber her tiştî dilekî pak,  
ji heval û hogiran amanceke çak !  
Merovtî bi gotina rast her pêşve hat,  
ji însên re kirinên qenc bûne xilat.

IX-87

## YEKETIYA GELEKÎ +

Ew gelê bi yek be,  
ew gela nayê xistin.  
Rabe ser xwe,  
ev roja serbestî ye;  
alên rizgarîyê  
wa ne rabûne;  
û tu jî ê werî,  
em tev herin pêş ve  
û bi hev re em  
alên xwe û dengê xwe  
em ê rakine jor;  
roja me wa ye tê,  
ezman sor bû ye,  
tîne mizgîna rohilat.

Rabe cengê  
ê serkeve ya me.  
Rojên li hember me  
ji şevê çêtir in;  
de pêş ve heval,  
dilşadîyê bigre;  
hezar qîrîn û bang bila bibin yek.  
Gelê me rabû  
azadî dixwaze;  
rizgarîya welat nêzîk e heval.  
Mêze ke li kaşan !  
Agir hatîye dadan;  
ronahî da çar beşan;  
şevreşî divêt rabe !  
Karker'no, cotkar'no,  
rabin hemî bi yek bin !  
Ew gelê bi yek be,  
ew gela nayê vîstin !  
Rabe, ey bira,  
de rabe vûşka min;  
em tev vêxin çiran,  
gurr bikin têkoşîn !  
Mêr û jin tev,  
em milan bidin hev,  
bila ala rengîn rabe jor û jor û jor !  
Bes e êdî,  
bes e koletî.  
Pêşmergeyê hêja  
rijand xwûn biha;

dijmin pîrr tîrsiya,  
li zîndan cîh nema.  
Rabû, rabû,  
gelê me j' xew rabû;  
baş dinase neyar,  
ew dilreşê xwûnwar,  
dijminê çanda me;  
welat û niştîman  
bo me kir neman.  
Wey dijmin, ey bê bext,  
agir wa ye vêket;  
Kurd û Kurdistan nam'rin;  
azadî em ê big'rin !  
Karker'no, cotkar'no,  
rabin hemî bi yek bin;  
gundîno, rêcberno,  
bo azadî bi yek bin !  
Ew gelê bi yek be,  
ew gela nayê xistin !

1982

\* Di nivîsandina vê helbestê de ez di bin bandora helbestek SERGIO ORTIGO (EL PUEBLO UNIDO) de ma me. Li şûna ez helbesta wî raste rast wergerînim kurdî, min ew goreyî rewşa welatê xwe nivîsandîye. Helbesta EL PUEBLO UNIDO li Emerîka başûr bûye sîmbola berxwedanê.

Helbesta Yeketiya Gelekî wisa hatîye nivîsandin, ku pêwan e bi meqama EL PUEBLO UNIDO were stiran.

## BIHARA WELÊT

Bihar e, çi bihar e,  
Lê rindê;  
Siwaran xare-xar e,  
Çelengê;  
Neyar bî kûç'kê har e,  
Zer'ya min !

Zevîyê me bi mit e,  
Lê rindê;  
Siwaran kute-kute,  
Çelengê;  
Dêla nokeran qut e,  
Zer'ya min !

Gundê me çiq a \weş e,  
Lê rindê;  
Çemê me \uşe-\uşe,  
Çelengê;  
Rûyê caşanî reş e,  
Zer'ya min !

Ro li nivê ezmên e,  
Lê rindê;  
Keçên ciwan li rê ne,  
Çelengê;  
Evîndar wan dipê ne,  
Zer'ya min !

Welatê me zor çak e,  
Lê rindê;  
Evîna ya dilên pak e,  
Çelengê;  
Kurdistan bo me \ak e,  
Zer'ya min.

VII-87

## ZAROK Û STÊRKA RIJIYAYÎ

Stêrkek rijiya,  
ji ezmên hat e xar;  
ne got av,  
ne kir qûrîn,  
ne jî qar.  
Ezman her ma çeleng,  
bilind û pesindar.  
Stêrk biriqî  
û hat, hat, hat,  
lê dûvre ne hat,  
wenda bû li jor.  
Çavên zarok li stêrka rijiyayî geriyân,  
geriyân û geriyân.  
lê ezman bû av,  
stêrka biçûk tê de heliya.  
Di şelta li ser maxa kelpîçîn de  
mindal bi dizî giriya  
li ser stêrka. ku rijiya  
û bi dilek şînok ket xew,  
lê ber razê li ber xwedê geriya,  
ku stêrka biçûk di wendabûnê de hatibe êşandin.

1986

## JÛYANA JINEKE KURD

Berf li derva dibariya, dunê sar bû;  
Gur li serê kêş diqirriya, gellek har bû;  
Di xanîkê kelpîçîn de çirakê bi zor şewq dida;  
Nalînek zirav dihat der, di şevreşiyê de dihiliya :  
Zarokek Kurd dihate cîhan;  
Bê tixtor,  
Bê derman,  
Bê ku bizanibe çima.  
Bi nişkekê ve dengê dêrgûş hate guhan;  
Pîrika gund mindal rakir, da ser destan :  
"Tu bi xêr hatî keça şêrîn, qîza ciwan".  
Lê dayikê seri rakir, hêstir ji çavan dibariyan;  
Ew li benda lawekî bû, dilê xwe şa kir neh mehan;  
Waye fedîkar derket rebenê,  
Pirr şerm dikir ji mêrê xwe,  
ji gundiyan.  
Bi tenê ma demekê dayik û dest pê kir bilorîne :  
"Rakeve keça min, razê, navê te Eyšan e;  
Tu ê sibe mezin bibî, herî ber berx û karane.  
Bila xortên gund bibêjin, ev keça zor ciwan e;  
Bibe qîzek jîr û zana, xwedan nav û deng û şane".  
Eyšan û hevalan lîztin bi ax û kevir;  
Derbas kirin bi yek kiras roj û mehên pirr;  
Ne pirtûk dîtin, ne pênuş;  
Ne fêkî xwarin ne şekir.

du rojan birçî, yekê têr,  
Eyşo derbas kir.  
Dû heşt salan gotin Eyşo :  
"Êdî me lîz tev mindalan;  
Ji vir û şûn ve karê te ye mezin bikî \u00d7ûşk û biran".  
Duwanzde salîn por veşartin,  
Li wê kirin kiras û xeftan;  
Sibê Eyşo tepik çêkir û dû nivro jî çû qirşan;  
Zivistanê bû kebanî û havînê ket ber palê;  
Dixebitî, pîrr dikir kar, lê \u00d7êr ne dihat wê malê.  
"Lê, lê, Eyşo, tu dibî bûk";  
Rojkê gotin pîr û kalê.  
Wek hespekî ew firotin, wek ebdekî kirin malê;  
Çarde salîn Eyşo bû bûk, panzde salîn bû diya salê.

Û salên bi derd û kulan avis \u00d7uşyan, ...  
Ronediye Eyşanê;  
Dayik duanzde zariyanê.  
Dudu ji wan bi sorikan mirin,  
Sisê bi umrê çelrojki  
û heft jî te \u00d7wedî kirin ji wan  
Bi nanê cê û gêrmiya rijî.

Payiz çû û hat zivistan;  
Li derva dibariya berf û baran;  
Dîsa har bûbû gur li çiyân.  
Di şevreşiyê de mindal digiriyan,  
Jinek nexweş dikir sikran;



Dîsa bê tixtor,  
Bê derman.  
Ro hilat, ew birin tirban;  
Li ser xwendin du pel quran.  
Ber ji merzel herin malan,  
Yekê bang kir :  
"Eyşo, qurban,  
Çel salîn çûy' axa goristan".

Eyşan hene bi hezaran,  
Keçên rencber û cotkaran.  
Kesek qe pîrs nake, çima  
Li wan bûye ev nifiran.  
Weqa Eyşanên me dimirin,  
Lê nabin ders ji kesî ra.

1981

## WÊNEGUHÊZ

Têlvizyona rengînê, wêneguhêz:  
Tu caran ne vemgîn î, wey rû-qîzêz !  
Dugmeya te badide hema her kes,  
Tiştên bûyî û ne bûyî rêz bi rêz.  
Tişteyê nayê veşartin ji çavên te;  
Mêjîyê te cu caran ranaweste;  
Bo hinan qeşmer î, derbas dikî dem;  
Bo milyonan jî tixtor û mamoste.  
Bo te ezman li jor êdî ne dûr e,  
Ne jî derya bo te fireh û kûr e.  
Raber dikî bi şev û roj tu wêne;  
yê kete te nema êdî dimire.  
Dugme livand derket beşek ji Berlîn;  
yek din livand, îcar me dît girî û şîn;  
Dîsa livand, wane hinek baz didin;  
Û carek din, îcar jî hat Filistîn.  
Têlvizyonê, tu çiqra rind û ciwan;  
Nêzîk dikîye ji hev vak û gelan,  
Lê te jî ne kir bo gelê min tu sûd;  
Zirar î tu, ne kar î bo Kurdistan.

IV-86

## BALAFIR

Kulavek gewr-sipî hatiye ravistin;  
na, na, kulav nîye, belkî hirî ye.  
Kuro, ne hirî ye, ew berfek hûr e,  
bi şev bariyaye, erd veşartîye.  
Bi daxewa çavino, welle hûn şaş in;  
yên li binê me, ewana ewr in,  
civiyane li hev, wek pembîyê gewr in !  
Ey balafir, balafir, tu \weş difirrî,  
çarsed û pênce kes di hûrê te de !  
Balafira rindik, firroka kafir;  
te erd li bin hîşt, \we zû wenda kir !  
Li jêr me ewr in, baran dibare,  
li jor me sayî, ro çî kîbar e !  
Demek derbas bû, ewr êdî ne man,  
kaş û feyd û newal xuya ne l' şûn wan.  
Çî siwarbûnek bi dilşadî ye,  
rewş li jor \oş e, tiji şahî ye.  
Bi nişka ve hat dengê kapîtên,  
got, dû demek kin em ê bigihên.  
Li bin bû bajar, \anî wek qutiyan;  
tombîl di nav de diçin wek mûriyan.  
Berê xwe li jêr, hate var hêdî,  
hebkî xwe hejand, dûvre riya xwe dî.  
Kewikek gewre, qewîn û giran,  
nêzik dike j' hev bo merov şûnan.

E M

Sed sal, hê bêtir :

roj bi roj,

meh bi meh

û her sal

me bang kir û dikin :

bo AZADÎ RABIN !

BI YEK BIN !

Û

em davêjin dijmin

û dibêjin :

ew ne rind in,

ne jî şêwe-çak û dilpak in,

û dîsa û dîsa,

car li dû car,

her dem,

tim û tim deng tê :

BIJÎ AZADÎ !

SERNWEBÛN !

Lê

me çi kir ?

Me çi guhert ?

Me çi dît,

çi nedît ?

Me çi kir û çi nekir ?

Ne neyêr şêwe guhertin,

ne jî me;

cîhan jî nehat guhertin.

Û

jiyan berdewam e,  
dunê difertile,  
û deqe  
mirin li şûnekê,  
jiyan li ya din,  
nû û kevin rê didin hev,  
hevûdin dikemilînin.

Em dizanin :

mirin birine,  
zû-dereng li pêş e,  
lê  
mirina hêdîkan,  
mirina bi êşandina salan,  
mirina tarîbûnê  
yeke tiji jan e,

û

ev e babetê mirina me,  
mirina hêdîkan e,  
mirina bi jan e,  
mirina hezar brînên kûr e,  
mirina şeva reş û qûl e.

û

car din têye gotin :  
neyar û yar ji hev derxin,  
yan, dost û hevalan binasin;  
vê rê û wê rê berdin,  
yan, vê û waya han bigirin;

lê  
her kes ji bîr radike,  
ku sed sal e wisa tê gotin,  
berdewam e kirîn û firotin,  
her dimîne guvaştin û dotin.

## VII-87

"LO KURDINO" !

ji nişka ve tê dengekî xemgîn,  
ji êşandin û guvaştinê tê der,  
ji derdê wendabûnê,  
ji ber babetekî birçîbûnê,  
bêçarebûna gelekî,  
ji dest dewarê bê şîr,  
şîrê bê rûn,  
rûnê bê tam,  
tama axû û heznekirinê,  
hezkirina nezaniyê,  
nezaniya nezanan,  
nezanên rûreşiyê,  
rûreşiya bindestiyê,  
BINDESTIYA ME !  
EM,  
emên tiji kesên li dû navan,  
navên bi rûmet,  
rûmeta li ser stûn û nîvekê,  
yan tew li ser qûma derewan.

Erê,  
ji dest wan hemiyan  
tê dengekî xemgîn û gran :  
EM IN YAR Û NEYAR,  
EM IN DOST Û DIJMIN,  
EM IN SEDEMA NEXWEŞIYÊ,  
EM IN HÊVÎ.  
EM IN MEREZA REŞ,  
EM IN DERMAN.

Erê,  
yan em ê werin guhertin,  
fêrî rêya rast bibin,  
li hevûdin bicivin,  
tev rabin û bikevin,  
yan jî mirina bi qîrîn,  
jiyana bi şîn  
ê bidomînin !  
Zanibûn dijwar niye,  
nezanî dikare rabe,  
hêvî dikare bizê :  
hêviya jiyanêke tev,  
tevbûnêke neteweyêke bextiyar,  
ku têde endam mafê yên din û xwe binase,  
derew û derewîn ji holê barkin,  
û  
her kes xwe û hêza xwe nas ke,  
ji ber wan ve şerm neke.  
Û  
deng car din hat :

XWE BO WELAT,  
NE WELAT BO XWE,  
TÊXIN KAR !

Û

WELAT BÊ GEL NE WELAT E;

gel jî ji merovan pêk tê :

yê ji merovan hez neke,

nikare ji gel

û wisa ji welêt

hez bike.

Ta

roja em li hev û li gel viran bikin,

yek gora yê din bikole,

yek ji yê din biheside :

niye bo me hêvî !

Û

sedsaleke din ê biçê

û mirina hêdîkan,

mirina bi jan

û bidomîne

û

heye ku rojekê hestê janê jî wenda be :

ew e tirsî mezî,

ew e tirsî mezî,

ji lewra bi kêmasî,

ta hestê janê hebe :

heye jîyan.

VII-87



## K O B A N Î

Ey Kobanî, Kobanî, ey Kobanî !  
Ez dibihîsim tu wek berê nezanî,  
lê dîsa jî tu li cem min giran î.  
Ey Kobanî, li du hêlên te kanî,  
li bakurê te neyêr mayîn danîn,  
tu ji xwûşkan veqetandin b' hêsanî.  
Eşîrên te li serên hev bûn boke,  
hê îroj jî şênîyê te ne yek e.  
Kobanî, me hevdu nedî bi salan,  
ez pirr geriyam li welatan, nav gelan,  
lê ti caran tu ji bîra min narî.  
Kobanî, rencber û gundî çawa ne ?  
Dibên hin ji wan li ber mehkeman in;  
ji wan re bêj' ew heval û bra ne.  
Kobanî, ez zanim şev li wir reş e,  
lê dilê min ti caran te nafroşe,  
bê welat û xwedî jiyan ne xweş e.  
Kobanî, slav ke karker û cotkar,  
slav ke zarokên vas û stûwar,  
keçên êsîr, pîrên nexweş, yên bêwar.  
Kobanî, slav ke li xortên dilşîn,  
li gundên me, li Qamîşlok û Efrîn.  
Lê Kobanî j' xortan re bêj' ka mizgîn,  
sal derbas bûn, çima em hê dilbrîn ?!  
Li vir û wir rojên me tim girî û şîn.  
Ey welato, nokeran biqewtîne,  
êdetên reş li wir bişewitîne,  
toreyên baş careke din vejîne,  
law û keçên wenda l' xwe vegerîne.

1981

D A Y Ê !

Dayê, metirsîn zarokên xwe ji gur û dêw û cinawiran !  
Dayê, metirsîn zaroyên xwe ji merovan, ji leşkeran, ji cendirman !

Wan metirsîn ji xocan, ji mamosteyan û ji bavê wan !  
Dayê metirsîn mindalên xwe ji jîyînê, ji mirinê, ji tav û brûskan !

Yadê, metirsîn çêlikên xwe ji şevreşiya êvarê,  
lê wan bitirsîn ji tarîbûna nezaniyê, ji şewata bindestiyê,  
ji koletiyê !

Yadê, hişar ke zarokên xwe :  
Bila nekevin feqên xwûnvaran,  
bila nebin azepên dizan,  
bila neyên xapandin di dehf û dolab û derewên xasûk û bêbextan !

Yadê zarokên xwe fêr ke hezkirinê :  
Hezkirina merovtiyê,  
hezkirina azadiyê  
û wan ho ke hezkirina zimanan,  
lê baş bizanibe. ku hebûna wan nîvçe ye bê zimanê  
bapîran !

Dayê mindalên xwe fêr ke wekheviyê :  
Bila kesek nexwe mafê yê din,  
bila law nekin li keçan tadan,  
bila mêr nebin axe li serên jinan !

Dayê !

Dayê, tu bi firran dixî netewan, tu î hêviya me !

Mindalên xwe fêr ke niştimanperweriyê, ber eşirtî û "partîçîlîvîyê",

bila ji xwe û yên xwe hez bikin, li welatê bav û kalan xwedî derkevin !

Dayê, zaroyên xwe fêrî serxwebûnê ke,  
bo ji yên din re nebin doçik û netewa xwe re sedemên rûreşiyê.

Anê, bila refên sibe ji me çêtir bin, ji me azatir bin, ji me jîrtir bin !

Bila bi çolê nekevin, wenda nebin, neyên hilandin, wek zaroyên hinan ji me !

Bila nifşên sibe ji yên dû xwe re nebin serhevde, wek nifşê me !!!

1987

## BOKEYÊ GEL

Pêşmergehê pêşmerge,  
pêşî mirin. paşî ceng e,  
xwedan rûmet, nav û deng e,  
ey pêşmergehê pêşmerge !  
Ger hebe bo me sedema serbilindiyê,  
tu î sedem;  
ger nav û şan îroj hebe li cîhanê,  
te daye me;  
ger kesî got : Kurd mêrxas in,  
tu î bokê me;  
ger netewa me hê hebe,  
tu î dilê me.  
Bazê çiyar î. Pêşmerge,  
canê Kurdanî, çavekem;  
li ser milan rext-tifing e.  
Netirs û fêde l' kaş û newal,  
roj û şevên pîrr dûr ji mal,  
têkoşînê bi kar tînî,  
didî şevê bi xwûn ronî.  
Yên wek min ji stan dûr in,  
kul wek feydên welêt kûr in;  
bi saya te em xwedan nav,  
bo dara me tu didî av.  
Ger hebe serxwebûn, tu î hîwa,  
pêşmergehê serê çiya !

## GOVENDA NETEWA KURD

Neteweyek heye,  
têde bi milyonan.  
Dixwazim bigihêm wan,  
biqîrim û bang kim :  
Mebin pezên sed şivanî,  
belav mebin li çar zozanan !  
Her şivanek heylok heye,  
her zozanek deh boke ye.  
Xort û keçên netewa Kurd !  
Jin û peyano !  
Guran zozanek li me kirin çaran  
û neçaran rê şaş kirin,  
û her şivanek li bilûrekê dixwe  
û ji her bilûrekê têyên deh deng,  
li ber her dengekî hene deh dîlan,  
dîlanên ji hev belavbûna me,  
kîbûna me ji hev diçirrînin.  
Çima ji wan dîlanên pîrr  
em dernaxin govendeke qenc û mezin,  
ku têde em hemî milan bidin yên hev :  
Govenda vejandina neteweyekê,  
NETEWA ME ?!  
Bipirsin ji \we wê pîrsê  
û bigrin li hev girtina govenda me,  
govenda me hemîyan :  
GOVENDA NETEWA KURD !

1987

## KU DE ÇÛN ?

Li vir hebû gundekî şên, hemî dar û ber;  
li navînê çavîke çûk, av jê dihat der.  
Li vir hebûn keçên çeleng bi kincên rengîn,  
xortên ciwan. gellek hêja, dil tiji evîn.  
Ax, ax, dilê \emgîn, ax.

Darên peyamê biharê gewr û sor dibûn;  
kal li hevûdin dicivyan, destan de qelûn.  
Li vir hebûn jinên bedew, teşî dirêstin;  
dengên zelal sitiranên xoş dilorandin.  
Ax, ax, dilê \emgîn, ax.

Xurist û merov tevî hev dibûn yek li vir;  
kew û şalûl tev di\wendin goranî nemir.  
Çi bû Xuda çî bû, şênî û şahî ku de çûn;  
heval û hogirên delal li ku wenda bûn ?  
Ax, ax, dilê \emgîn, ax.

Ev bêtarên li ser Kurdan kengê dawî tê;  
ev qedera reş e tarî kengê ved'ke rê ?  
Bila gund dîsa şên bibe, ken vegere wir;  
bila jîyan dîsa were, bes êdî Kurd mir.  
Ax, ax, dilê \emgîn, ax.

1987

## ZOR SPAS STOCKHOLM +

Tev latên qaçê serbest û bêxem dilîzt gemiya min  
û ji wir pêşdariyekê li paş \uya kir, mezin dibû :  
bîrdariyeke gewre, hêza merovan raber dikir :  
STOCKHOLM !

Weqa min kir, di dil de hestekê bo peyda kim, yeke  
evînê,

rengêki tevgrêdanê, lê ne hêsan bû :  
zor sar bûn taxên te bo biyaniyan, kurt bûn rojên me  
tev, STOCKHOLM !

Di ew berbanga adarê de, tu ketî navbera çarçivekê,  
wêneyeke weqa çeleng, heku diçû biçûktir dibû,  
ta qemitî bi hêleke ezmên de û wenda bû di kûraniya  
bayê sar de,

ku bê şerm ji dûrketina roya paş ewrên bilind sûd didît.  
Di dil de, niza'm çima, hestekî li-te-pirsînê \we afirand,  
navekî di bîra min de : STOCKHOLM.

Heye ku em car din li hev rast werin,  
rojeke têde ro nêziktir be, dar kesktir û dil germtir bin,  
belkî li ser lêvan tew hebe ken !

Ger were ew roja, sorkulîlkan ez ê bo te diyarî kim,  
bêjeyan derbas guh kim :

Peyvokên spasiyê, yên tewandin û' bîrhanînê,  
STOCKHOLM !

Ne bo Volvo û Saaban, ne jî bo metroya bin taxên te,  
lê bo piyên vekirî ji zarokên gelekî re, neteweyeke di  
bin lêdanê de dinale;

û cîhan na\waze bibîne, rû veşartîye di paş refekî alan de,

li ba dikevîne li ber qonaxeke bilind -New York-,

bayê honik li rûyên karbidestan dixine,

ku di paş deriyên girtî de \u dane,

tevdêra dek û dolaban, lahf û dehfan li hev dirêşîne.

Ji te dûr, STOCKHOLM, welatek heye, jîyan rojekê dabû Selahiddîn;

îroj bi milyonan dil têde hene, şahî ji wan hatiye dizîn;

li ew warê dilên \xemgîn navê te ê bi sedsalan wer' bîrhanîn :

Spas, te bazekî me hewand, pîr bûbû ji êşa gelekî mêrxas

li welatekî, ku "ba\çê gulan" bû li ber çavan,

lê herweha bûkeke di bin brînan de pîrî perîşan :

KURDISTAN.

Dilê \xwe \xwûn digirî, \xwûna ku dibû bêje,

ji keviran hişktir bo neyarên aştiyê, lê bo ewên di zincîran de zehf şêrîn,

lêkerên nemir, ku dibêjine serpêhatiya gelekî,

peyman daye sêrî li ber dijmin danayne.

Rojeke cotmehê bû, sar, \xatir ji te \xwazt Ciger\xwîn

û canê wî, bo azadiyê evîndar, nuha rast azad firriya

û \xwe gîhand ser çiyayên Zagros û Ararat,

li kuderê canên Zerdeşt, Kawa û \xudayên Kurdên kevînar di nav agir û ronahiyê de di dîlanê de ne.

Baş dizanim biharek li pêş e, berf tê de zû tê helandin

û çiya dizên, çemên bi hêz û heybet li rîyan siwar dikin,

ku zinar û tehtan bi ber \xwe dixin û \xwe digihînin berrî û çolan,



bo av bidin daran, ku berê azadiyê radikî li ser çemelan.  
Çar salan helbestvên şevên te yên sar pan, û roya  
welête zer kete xewnan,

welatê ku nuha girtîgeha bê nav e : KURDISTAN;

bo xwe şevên sar germ kirin bi helbestan,

helbestên ku jiyana xistin tîpan, afirandin bêjeyên weke  
stêrkan.

Rojeke ji rojên demê tarîbûn dişkê, dawiya berf û pûk û  
bahozan tê :

li gundekî serê çiyayên Kurdistanê xwendegheke vedibê

û di odeyeke wê de keçek di xwaze navekî li ser xerîtakê  
bi cîh bike,

û li ser textereşê dinivîsîne navê welatekî, SWÊD :

Spas bo çeyîyên te, bo warê te dayî merovên me, pirtûkên  
te çap kirî,

spas ji te re, ZOR SPAS STOCKHOLM !

Heye ku keçeke Swêdî were li welatê wê bibe mêvan, li  
Amedê, yan Mehabad

û herdu tev, dest di dest de ê bi xwînin stranên aşî,  
evîn û azadiyê.

1984

+ Ev helbesta ku ji inglîzî hatiye wergerandin, di dawiya  
cotmeha 84an de bi rêya balyozxaneyê Swêd li Canberra  
bo Mîrza Olof Palme, serokwezîrê Swêd, hatibû pêşkeş  
kirin.

## DENGÊN JI DÛR

Ba honik e, pël li ser çemelan bazdidin;  
derya hêşin, ta dibînî wê de dikişe û dihere.  
Ro li nivê ezmên şa ye, ronahîyê j' xwe dibarîne;  
pêlên behrê sivik sivik dilivine;  
li hin şûnan av eynik e, şewqa royê vedigerîne.  
Çivîk dilşa nin, distirên û dilorînin;  
kewên deryan, gewr sipî, çeleng,  
tu dibê belkî nalivin, difirine.  
Çar-pênc ewrên piçûk li jor  
dane şopên hev, bi hev re dilîzine.  
Li ber çavan kulîlkên rengîn dikenin,  
sor û zer in, mor û gewr in, ...  
ser xalîyek kesk in hemî,  
çi xweşik in, çi nazik in,  
xwe li ba dikin.  
Xwûnşêrînek sê-çar salîn daye şopa qoqîyek rengîn,  
li pê dibeze; dayik li paş,  
herdu bi hev re dikenine.  
Jin û mêr,  
keç û xort,  
cot bi cot,  
dest bi dest de,  
yan pî li ser newqên zirav, dimeşîne.  
Xweş e jîyan;  
niza'm çima ev dil wisa her xemgîn e !  
Dikim nakim, azad nabim !  
Ji dûr, pîrr, pîrr, pîrr dûr, dengine têne,

hinek di şevreşîyek tarî de diqîrine :  
dengên ne-şahiya gelekî,  
çaviya hebûna min,  
\wedîyên zarokiya min;  
bera nadin,  
her bang dikin,  
her bang dikin,  
bera nadin, ...  
Ger bixwazim. an ne \wazim,  
ne kes im ez bê wan;  
û çîqa dûr bim jî,  
mijê şîna wan dilşadiyê ji min vedişêre.

XII-86

## J I N +

Ma te bidim hember rojeke havînê ?  
Bo min çelengtir î tu, ji wê germtir î.  
Ba kulîlkên gulanê carne dêşîne,  
û havîn tenê di çelê \we de dimîne :  
çavê ezmên geh bi şewqa \we d'şewtîne,  
Geh jî rengê \we yê zêrîn vedimrîne;  
Sal ji sala din ferq dike, tê guhertin;  
Dem û dewran ji kesî re tum namînin;  
Lê havîna te y' bê dawî melûl nabe,  
Ji sûfetê te yê şêrîn dest ber nade;  
Mirina reş jî ned'kane te d' sîyê ke;  
Tu û demê tev didomin, rêçik yeke.  
Ta ku peyak nefes hebe, çav bibhîne,  
Ev rewş dajo, te jî bi \we re dijîne.

+ William SHAKESPEARE (1564-1616).

Wergerandin ji înglizî : Şahîne B. Soreklî  
(Sydney, 1985).

( Ev helbest, çarde-mal 18, bê nav e. Navê  
'JIN' ji hêla min de hatîye danîn).

## YAN KURDISTAN, YAN NEMAN !

Hîro şev reş e l' welat,  
Lê dîsa tê rohilat;  
Mizgîna me waye hat.

Ey welato. Kurdistan,  
Navê te hîn hê l' cîhan;  
Li ba me Tu pirr giran.

Gelê Kurd ranakeve;  
Ji ber dijmin nareve;  
Ala wî ê l' ba keve.

Bes e êdî şevreşî,  
Ketvarin û rûreşî;  
Gurr bikin wê şoreşê.

Ar çirûsk dan ser kaşan;  
Dengek hat ji pêşmergan :  
Yan Kurdistan, yan neman !!

1982

## V E G E R

Keçê delal, dilê heval, tu bide min wan destan;  
Em tev herin, malan bar kin, xaniyan lêkin li deystan.  
Welatê me l' hêviya me ye, xwûn digirî Kurdistan;  
Em jî li dûr sêwî mane, çirmîş bûne l' bajaran.  
Lawo rabe. heval rabe. were'm herin Kurdistan;  
Tev vegerin, bi cîh bibin li nav heval û xwediyên.  
Em xebitayan, me derd kişand; em pîrr geriyan nav  
cîhan,  
Lê dilşadî ji me dûr ma; rabe'm herin cem Kurdan.  
Nameyek hat ji welêt de, dibêje gund gîh vala man;  
Erê gellek warên bi deng îro mane pîr û kalan.  
Bi sed hezaran xortên ciwan çûn xebata bajaran,  
Bo li wir dewlemend bibin, lê li welêt venegeriyan.  
Bajaran hemî deng daye; xweş e j' dûr ve dengê defan;  
Kes nizane l' me çi dibe; werin ji min pîrs kin derdan !  
Li Berlînê û Frankfortê, "Gastarbeiter" ji me re dibên  
Aleman;  
Bo biyaniyan nabin heval; bi wan dikin karên giran.  
Li Stembolê, li Helebê, here biger li wan peyan;  
Rûniştine di şeva reş de, bi ro dikevin ber keviran.  
Bira, şîreta kekê xwe bigir, şahî nê kirîn bi peran;  
Li şûn mehêl welatê xwe; li wir lêxe def û zurnan.  
Me ji gundên xwe xatir xwazt; me got em ê lê vegerin  
pê du salan.  
Du sal çûn, bûne çar salan; zengîn ne bûn em li waran.  
Welatê me l' benda me ye, hezar çav li rê qetiyan;  
Werin xortino, werin keçino, em tev biçin Kurdistan !

1980

## KULÛLKA DAWIYA ZIVISTANÊ

Wa ye, wa ye, seri rakirî, zer dike !  
Lo çi çeleng e, lo çîqa dilê min şa dike !  
Ez dibezim, ez direvim, ez digihêm gulekê,  
li dawiya zivistanê : ev gul yekem kulûlk e !

Bê hişên \we mijûl bikim  
meraqa dil bi şûn dikim :  
hew dibînim gul jê bûye,  
bi ava wê dest şil bûye.

Hawar çi bû, çi bû min kir ?!  
kulûlka salê ya yekem bû min jê kir !  
Dikim-nakim, \ûşkeke wê bi cîh nakim;  
gul bi hêsrana dide zanîn : tenê yek im, tenê yek im !

Kulûlkê pîrr ber \we dabû,  
ber destpêka biharê jî seri rabû !  
Bextiyar û rûkenok pesna \we dida,  
ta ku îroj bo qenciyê bû canfida.

Dilo, dilo, hawar, dilo : çi bû me kir ?!  
Me jiyana kulûlkeke ciwan-jîrek lê wenda kir !  
Zerkulûlk, ez bi gorî, bibexşîne,  
ez te têxim nav pirtûka dilê b' şîn e.

Bila sond be, gewre sond be bo Zerdeşt,  
ger li ser kaş, yan li zozanan, yan li deşt,  
nema êdî ez dest davêjim kulûlkan,  
bo \atirê ev zergula spehî û ciwan !

1987

## PELIKA ZER

Pelê, pelika daranê,  
Çiqa xweşik û ciwanê !  
Waye îroj zer bûye tu,  
Ketîye binê linganê.

Tê' bîra te, ber du heftan  
Çiqa kesk û gênc bûyî tu ?!  
Çermê rûyê te yê nermik  
Bi jîyanê re dikenîya !

Germa havînê bê wujdan  
Ava tamarên te kişand;  
Bayê payîzê tu xist var  
Bo tu dîsa bibî xwelî.

Mezeyid ji min, lê pelê,  
metirse ji mirinê !  
Jîn û mirin bê hev nabin;  
Ger şev ne be ro hilnayê.

1986



Derbas nabe şev, ne rojek,  
 bê bipirsim,  
 ji xwe,  
 bê ku ji xwe bipirsim :  
 çima ?  
 çima li vir,  
 ne li wir,  
 çima li vir û ne li wir im ?!

Duhu

zarokan û diya wan,  
 duhu hanîn bîra min,  
 bi ken û dilşadî:  
 çima, ez jî nizanim:  
 hanîn bîra min :  
 41,  
 çel û yek saliya jiyana min.  
 Kude çûn ?  
 çawa derbas bûn ?  
 Li ku bihurîn ?

41,  
 çel û yek salên cuda,  
 salên rengîn,  
 geh bê xwê, geh jî şêrîn.

41,  
 çel û yek salên jiyaneke bê welat,  
 bê welatekî serbi\we.

Û

sibe jî,

û ta roja mirinê pirs her dimîne :

veger

kengê

em :

em ê kengê vegerin ?

Ber bi zarokiyê diçin dil û bîr,

ber bi pîrbûnê giyan û hebûn,

di navbera wan de jî ezekî wenda :

li paş me rojên zarokiyê,

li pêş me kalbûn û pîrbûn,

û em jî di navbera kişandina wan de,

di navbera wan de em têtên çirrandin.

Û di kûraniya hebûna me de

agir û \wûn hevdûdin dişon

û ji wan şewat û jan di dilên me de dizên,

emên ji welêt dûr,

ji welatekî brîn. pîrr û pîrr dûr;

em, ew kesên di \ewnan de merzelan dibînin :

gorên dê û bavan,

\ûşk û bran,

heval û hogiran.

û gorên rojên borîn.

1987

## XWENDINA BI KURDÎ

Merovekî gellek jîr e  
(na, ne jîr e !)  
Ew kesekî pirr zana ye  
(ne bo me ye !)  
Mamosteyekî b'rûmet e  
(baş e, baş e !)  
Li cîhanê ew geriya ye  
(di gera wî de bo me çi ye ?)  
Bo welatê \we giriyaye  
(lê çi kelk daye ?!)  
Kurd e, ji zimên hez dike  
(ev ne rast e, qe ne rast e !)

Ger ew heval rast pirr jîr e,  
mamosteyekî "qedîr" e,  
zehf geriyaye. bo welêt jî ew giriyaye;  
çawa dibe : hê \wendina zimanê \we nedizane !!

Merovên me bi hezaran  
fêr bûne du-sê zimanan;  
tew hinek jî ji me tixtor,  
yan "devrimê" dikin bi zor,  
pêzan-têgihîştin bi şor,  
lê bi Kurdî \wendin bo wan  
bûye weke heft diwaran.

Emê çawa hevûdin fêm kin,  
hestên dilên \we di rê kin:

wek endamên netewekê  
berên darekê tev jêkin,  
ger pêkanî l' holê nebe  
em ji eynî çaviyan vewin ?!  
Xwûn bê vwendin sûdê nade,  
netewek bê pirtûk nabe :  
wujdan bikin, qîret bikin,  
Kurdî ho bin, Kurdî fêr kin !

1987

## N E W R O Z

Şeva reşê zû bar ke.  
bar ke, bar ke, bihar e.  
Lo siwaro, zû var ke,  
hespê var ke, ne sar e;  
wê mizgînê belav ke,  
gundîyên me hişyar ke :  
BÎST Û YEKÊ ADAR E !  
Newroz e, roja nû ye,  
êvar dawî hatiye,  
şev çû, êdî ronî ye,  
zivistan çû, vweşî ye.  
Newroz e, roja çak e,  
dawîya Dehhakan e,  
cejna Kurdên dilpak e.

1987

## EY ŞEHÎDAN

Ey şehîdan !

Ey şehîdan !

Ey cangorên Kurd û Kurdistan !

Hûn namirin, na !

Hûn namirin, na !

Na, na, na !

Gîyan dihere,

dikeve nav axa Kurdistan,

lê canên we,

lê ruhên we

dikevin nav xwîna me.

Hûn namirin, na !

Hûn namirin, na !

Na, na, na !

Welat xwelî ye,

hûn jî ava wê,

jiyan didin navê Kurdistan.

Hûn in hebûna me,

hûn in xoybûna me,

hûn in bo Kurd hejên niştiman.

Hûn namirin, na !

Hûn namirin, na !

Na, na, na !

Nifşên li pêş me.  
Kurdên salên tê'n  
ji xwîna we têne der.  
Jiyan berdewam e.  
em hene b' saya we.  
hûn av didin rehên dara me.  
Ey şehîdan !  
Ey şehîdan !  
Ey cangorên Kurd û Kurdistan !  
Hûn namirin, na !  
Hûn namirin, na !  
Na, na, na, na !

1988

## XWEZÎYA EZ MÛRÎYEK BA MA !

Xwezîya ez cotkarek ba ma li dawîya dunê,  
yan gavanek serbi\we li newalek kûr;  
Xwezîya ez nezaneke ba ma, bê \em û bê derd,  
yan qeşmerek dilşa, ken bida zarokan;  
Xwezîya ez mûrîyek ba ma li mûristanek şên,  
yan jî mêşek hingiv, pîrr jîr û sivik !

Ez derketim ji gund, geriyam li welatan;  
\wazt bibim cîhanperwer, welat bîr bikim;  
min dît jêr û jor, rohilat û roava;  
wan in bîst û yek sal li derve heliyan.  
Min bihîst û dît, nivîsand û \wend;  
fêhm nakim çima sal bi sal dibim Kurd !

Kêf kêfa koran e, nabînin çi dibe;  
dem dema kerran e, nab'hîsin çi tê gotin;  
\welî l' serên wan be, yên rewşê fêhm dikin,  
dizanin çi dibe li der û hindir !  
Hin dibên em mêr in, cîhan me nas dike;  
hin jî bi girî û şîn ji doza \irab.

Ey bextereşên me, a\ ji derdê we;  
hûn dijîn di xewnan de, jîna we mirin;  
ey hawar ji derdê hin serokên me,  
gavek wan li pêş. lê du gav li paş;  
wey haho ji destê derewçînên me,  
pirr zimandirêj in, lê sûd qe tune !

Cinawirên çolan standin mafên \we;  
em hê ne dizanin em çi dixwazin !  
Hin wa nin diçin ser hîv û stêrkan;  
em hê ne dizanin derdê me çi ye !  
Kûçik û pisîk êdî tev dijîn;  
em bo hev neyar in, bêçare û nezan !

Dil tiji şewat e bi şev û bi roj;  
deng êdî nema ji bang û qîrîn,  
lê mal\we pirr in, kesek nab'hîse;  
sedsala bîstan wa ye tê dawî,  
em ne gihîştin mal, rêwîyên bê kes,  
ne jî ji şaşetî em fêr bûne ders.

1985



## BO XORTÊN GIRTÎGEHA DIYARBEKIR

Xortên Kurdan, Xortên Kurdan,  
Li Diyarbek'ra qehreman !  
We ji bo me agir vêxist;  
Hezar silav ji van dilan.

Xortên me yên wekî şêran  
Girtin û kirin zincîran;  
Derket agir ji ruhên wan,  
Ronahî avêt nav Kurdan.

Hin xortên me xwûn rijandin;  
Dara azadî mêjandin;  
Can dane ber top û tankan,  
Dilên faşîstan êşandin.

Ey camêrên hêja l' zindan;  
Hûn bûn rêber ji bo xortan.  
Hezar salên din jî herin,  
Namirin Kurd û Kurdistan.

Ey faşîstan, hûn ne rind in;  
Hember we em zor bilind in.  
Yê we çîqa pirr bin tîfing,  
Em hê Kurd in, em hê merd in.

Xortên me, hûn li ser seran !  
We nav rakir hemî cîhan.  
Bijî azadî û serxwebûn;  
Her bijî Kurd û Kurdistan !

## STIRANA MASIYAN

Ger şêr herin ji nav dar û ber,  
Rûvî û şeqal tên meydanê;  
Ger nezan bibin pêxember,  
hêvî namîne l' cîhanê.

Zarok birçî, seg di\wun têt;  
Camêr digrîn, ker dibin mêt;  
Xwelî l' serê wî gelî be,  
Ew dikeve şûna dewêr.

Roj dibin reş, şev ron dibin;  
Tavên ezmên, ew ber birûskan deng didin;  
Gur dibin leşker har dibin;  
Merov zimanên \we di\wun, tev lal dibin.

Hezar spas ji Te re. Nûda;  
Em bûn masî, ne bûn însan;  
Nabin serok hov li ser me,  
ne kes \we difroşe b' peran.

1981

## GOVENDA NEWROZÊ

Keça ciwan. şêrîn ê;  
lê çelengê, dilvînê;  
porê mor ji hev veke,  
li ber neynikê şeke,  
lê şêrînê, lê dilvînê, ...

Kincên bedew li \we ke,  
ala rengîn dest \we ke;  
em ê biçin Newrozê,  
Newroz li me pîroz be,  
lê şêrînê, lê dilvînê, ...

Keçê serê \we rake,  
bejna zirav li ba ke;  
em ê rabin dîlanê  
tev keç û vortên hanê,  
lê şêrînê, lê dilvînê, ...

Li dor agir civiyane  
bo cejna Kurdistanê;  
bilezîn ez heyranê,  
em ê rabin dîlanê,  
lê şêrînê, lê dilvînê, ...

Newroz e ha, Newroz e,  
bo gelê me pîroz e;  
sê hefteyên adarê  
rêçik dane biharê,  
lê şêrînê, lê dilvînê, ...

Hurmuz hat çû Ehreman,  
ji vir bar kir zivistan;  
roja zer êdî serdar,  
kesk dibin zevî û dar,  
lê şêrînê, lê dilvînê, ...

De bilezîn, ciwanê;  
em zû biçin dîlanê;  
Newroz li me pîroz be,  
bo cîhanê xweş roj be,  
lê şêrînê, lê dilvînê, ...

Bextiyarî û evînê  
Newroz ji me re tînê;  
em ê biçin dîlanê,  
govenda Kurdistanê,  
lê şêrînê, lê dilvînê, ...

1987

## MIZGÎN NE HAT

Ro reş bûye li ber çavan;  
Zivistan çû, bihar nayê;  
Şahî û xweşî wenda bûne,  
Li welatim girî û ta ye.  
Darên kulîlkan bê gul man,  
Kewik û şalûl bê deng man;  
Neyar serdest û zordar e,  
Kawa, reben, girê dane.

Azadiya l'xerîbîyê  
Serbest ne kir dilê xemgîn.  
Bi dermanan can tezandin,  
Lê ruhê min her ma birîn.  
Gotin bîra bike welat,  
Lê roj dû roj kûr bû evîn;  
Kurdistana min e çeleng  
Hê dinale, ne hat mizgîn.

1986

## B Ê N A V

De bila ji min re ne kin gotina mafên merovan;  
bila şanî min ne din li New Yorkê qonaxa Yeketiya  
Netewan';

bila êdî kes bi min ne kene û ne bêje li cîhanê heye  
biratiya gelan;

bila melle û keşîş dest ji min berdîn, ez têr bûm êdî ji  
raketina xudayê wan.

Wa ye li dorhêlên cîhanê bi hezaran deng radibin,

di xwazine paraztina mafên mişk û masî û hûtan;

wa ye rojname û radyo û têlvizyonan

tiji kirine rûpel û weşînekên xwe li ser qehpe û qûnekan.

Ma nabin li gelê min tade,

qasî yên dibin li mişk û masî û hûtan, an qehpe û  
qûnekan,

lê gelo ji me hêjatir in cinawir û bênamûsên cîhan ???

Dilê min ji gîrr tiji bûye, ji qehrê avis bûye,

zor xeyidiye ji dost û dijminan;

min xwe paş ve kişand îşev ji nijada merovan.

Wa ne bi bilyonan dirav tên rijandin,

bo çêkirina çekên kujtin û şewatê,

dema ji derdê birçîbûnê têye nalîna sedhezaran.

Wa ye deng têye ji radyo û têlvizyonên cîhanê,

çawa didine pesna kaxezên paqîş kirina qûnan,

dema li Kurdistanê hesret ketiye dilên milyonan,

ku ew rojekê bibihîsin dengê tenbûr û biloran,

yan guhan bidin ser nûçeyên cîhanê; stiran û çîrokên

bapîran.

Pirr pêş ve çûye cîhan !

Wa ye ji Londerê derdikeve balafirek bi navê 'Concord',

bo danîşe li wê hêla cîhanê dû neh seetan,

dema li welatê min, bi tîfing û projektoran

sînor kirine navbera \wûşk û biran;

ew ji hev bi dûr \istine bi deh salan !

Bes e êdî em hatin \apandin !

Me kin ji min re bêjeyên ji serên we meztir;

me kin ji min re derewa biratiya gelan !

Ka \we li ku veşartine wan biran,

çima nadin me destan, bo me ra nakin dengan ?!

De ji min re me ke şora merovtîyê,

guhên min gemarîn bûn ji derew û viran.

Tu were em bipeyivin li ser şeva tarî,

ya ku di hindir \we de gêj kiriye bîst û pênc milyon

însan.

Kesek tune wan hişar ke.

1985

## M E G I R Î

Megirî, megirî, jina Kurdê, megirî, megirî  
Êdî bes e, \ûşka hêja, hêstir û girî.

Ez dizanim ev halê te ne tu hal e,

Mêr û zarok, mal û dewar, qirş û pale.

Tu dane mêr bi zarokî;

Dilşadî ne dît te roj'kê.

Rewşa jinên Kurdan berê ne wisa bû,

Lê di bin destên neyar de em riswa bûn.

Erê, erê, delala min, erê, erê;

Dil keser î ji derdan tu, erê, erê.

Dikişînî bi şev û roj derd û kulan,

Dirijînî b' dilê agir hês'rên çavan

Keçên gundan û bajaran, rabin, rabin;

Kurd û Kurdistan bê we qe rizgar nabin.

Bişikênin van zincîran, herin pêş ve;

Bes e êdî gelê Kurd ma d' şeva reş de.

Em paş ve man, em bûn \izan;

Em bûn êsîrên van dizan.

De rabe delalê j' \ewê, rabe \ûşka min;

Dijminên \we baş nas bike, rab' hevala min.



Erê, erê, delala min. erê erê;  
Neyarên me pîrr dilreş in. erê, erê,  
Lê nezanên me jî cahil mane;  
Jina Kurd ji derdên wan pîrr perîşan e.

Namûsa Kurdan ketiye binê lingan;  
Em rûreş in, em bê nav in li nav cîhan.  
Bes e êdî em bi saxî ketin goran;  
Rabin ji xew, dem dereng e, gelî Kurdan.

1980

## LI SIRGÛNÎYÊ

Rojekê j'rojan welatek min jî hebû, pîr çeleng;  
dirêj dibûn têde maî +, menevşan ++ xwe li ba dikirin.  
Xewnek bû ew ax, çi xewnek ciwan.  
Ez radimûsandim welêt bi zimanê bav û kalan,  
Bi min re digot bi Almanî  
(nayê aqilan çiqax weş bûn ew peyvên şêrîn) :  
"EZ HEZ DIKIM JI TE".  
Xewnek bû ew ax, çi xewnek ciwan.

\* Cinsek ji daran.

++ Cinsek ji kulîlkan

Heinrich Heine (1797-1856)  
Wergerandina ji Almanî : Şahîne B. Soreklî

## LAWEK JI ASRA

Keça çeleng qîza sultên  
Bi hatina êvarê re  
Berê xwe dida çavîya ava zelal,  
sivik sivik diçû dihat.

Ebdekî xort êvar êvar  
Li nêzikî çîlikên ava zelal  
Xwe dida benda keçikê,  
Heku diçû melûl dibû.

Natûn rojekê bervê hat :  
"Navê xwe tu zû bide min.  
Xelkê te kîye bêj' lawo,  
Tu ji kîjan welatî ye !"

Û xortê ebid jî bersîv da :  
"Muhemmede navê min, ji Yemen,  
Ez ji eşîra Asra me,  
Dema aşîq dibin dimrin".

Heinrich Heine (1797-1856)  
Wergerandina ji Almanî : Ş. Soreklî

## K A L Ê K U R D

Di berbanga sibê de  
beri daye bajêr,  
hêdî-hêdî dimeşêye.  
Jan ketiye çonga rastê,  
ji ber êşê dikulêye.  
Kalo, kalo, rebeno !  
Belengazo, xizano !  
Di vê sermê û pûkê de,  
çima wa perîşano ?

Li bajarê Viyana,  
di çayxanên xweş û germ de  
yên wekî te rûniştine,  
vexwarinan vedixwîne.  
Li bajarê Sîdniya dûr  
yên di umrê te de l' ser xwe,  
bi ajniyê, bi lîstikan  
demên xwe derbas dikine.

Lê merovên me derdkêş in :  
di bêşîgê de her nisax,  
bi ciwanî xas dimeşin  
û pênçe salîn kal û pîr in;  
dibin lodên xem û kulan,  
giyan mala êşên gran.

Kalo, kalo, ax, lo kalo !  
Xweziya welatê me jî rizgar ba,  
hov li ser me ne serdar ba  
û yên me jî bikaribana bîponijin,  
ta em jî bikaribana bijîn.

1986

## D E N G

Deng, deng, teq û req, qar û qîr !  
Bavo serê min teqiya,  
dayê guhên min êşyan;  
bi şev û roj li her derê  
tum têye deng, dawî nayê.  
Mêjî ji wan westa bû ye;  
kêfa yê kerr li vir têye.  
Ev çi hal e, ev çi rewş e;  
sebir nema, tev heliya.  
Di rojên kevin de min got :  
Ez ê herim bajaran, lo !  
Bajar li ber çav bû bihuşt,  
xwedî û welat me li dû hişt.  
Me da dû şahîyê û beziyan,  
lê westa bûn, kesek ne gihîşt.  
Daxwaza dil îroj ew e,  
li welêt û gund vegerin,  
lê dîwarên gewre û bilind  
bûne sînor, qe na hêlin.  
Hawar heval û hogirino,  
ger ber mirinê ne çûm welat,  
xweliya bedenê bidin wir  
û bo Kurdistan bikin xilat.

1986

## DÛRBÛNA JI WELÊT

Ev bûn bîst û yek salên min  
ji welêt ez dûr dijîm.  
Min pîrr xwazt xwe bikim azad  
ji wan kulên dilê birîn,  
lê çawa jîn bê av na be,  
bê ro cîhan qe şên nabe,  
Yê j' welêt dûr jî şa na be.  
Ax lo dilo, dilo heyran;  
kengê em biçin Kurdistan !!

1986

## STIRANA KEÇIKA LI NERÎBÎYÊ

Şêrîn dayê destê m' bigre,  
tev em vezerin li welat.  
Sal derbas bûn, ez mezin bûm;  
min kir ne kir sebra m' ne hat.  
Şêrîn dayê ez bi heyran,  
Were em herin Kurdistan;  
bib'hînin heval û dostan,  
dapîr û xalan û apan.  
Rêya welêt gellek dûr e,  
lê evîna min jî kûr e.  
Jîn bi welat û gel xweş e;  
ger ew ne bin rû tum reş e.

1986

## ÇIYA Û ÇEM

Li welatê min heye çiya  
Li welatê min heye çem  
De were tev min lê  
Şev bi çiyê de hildiperike  
Û birçîbûn dadikeve çêm  
De were tev min  
Kî ne ewên di bin derd û kulan de ?  
Wan nas nakim,  
Lê yên min in  
De were tev min  
Wan nas nakim,  
Lê deng li min dikin  
Û dibêjin :  
"Em kul û derdkêş in"

De were tev min  
Dibêjin min :  
Gelê te yê ronedi  
Di navbera kêş û çêm de  
Di hembêza birçîbûn û janê de  
Naxwaze bi tenê têbikoşe  
Te jî tev xwe dixwaze  
Hevalo

Tu, ewa ez jê hez dikim  
Biçûk e, hebek gênim e sor e  
Têkoşîn ê dijwar be  
Û jiyân ê hişk be  
Lê tu ê werî tev min

Pablo Nîroda  
(Wergêr, ji Erebî : Ş. S.)

### ZORDAR NABE DOST

Bi sedan sal derbas bûn;  
Paşa û serok pirr hatin, çûn;  
Bav û kalên me \apandin,  
Gel çûn pêş ve, em man li şûn.

Segê dêl qut nabe tajî;  
Tu biratî j' kê di\wazî ?  
Ger Kurd neg're ew roya zer,  
Dê ew tum bimîne li der !

"Kerê sê qurş, sîpe du solt:"  
Laşê rovî nade te goşt.  
Ber mirinê bavê min got :  
Ewê zordar qe nabe dost.

1981

## ÇÛYÎNA ALEMAN

Ber çend salan em dilşa bûn  
Li gundekî serê çiya bûn.  
Gayê me mir, me ker kir cot;  
Bavê me mir, me rez firot.  
Ez ketim rê hatim bajêr;  
Rojekê birçî, yekê têr;  
Min dît paqir qe nabe zêr.  
Li serê min teng bû cîhan,  
Çûm qonsulosa Aleman,  
Stû xar kir wekî sêwîyan:  
Vîza dan min bo du salan.  
Îroj dijîm li Berlînê,  
Feran dişom bi makînê  
Zivistanê û havînê.  
Bo me dehan hê yek xanî;  
kesek derdên me ne d'zanê.  
Rojên me tev ax û keser;  
Ev çi hal e, Nudayê l' ser.  
Çima l' me belav bû pergal,  
Bo çi em venagerin mal ?  
Xwelî l' serê me be, heval !  
Warên me bûne şûna kund;  
Werin em vegerin li gund,  
Bikin yek deng, rakin bilind,  
Welat bikin azad û rind.  
Tu guh bide min, ey bira,  
Bo te bêjim şora pîran !



Pîr'ka min rehmetî digot,  
Heku bavo dihat ji cot :  
Lawê min bi\we vî nanî;  
Nan û dewê Kurdistanê,  
Ez wan nadim bi cîhanê !  
Heval'no jîna me reş e;  
Dengê defê j' dûr \weş e.

1981

JI KÊ RE ?!

Ma ez ê ji kê re bi\wînim helbestan,  
bo kê binivîsim çîrok û qulwerkan ?!  
Wa\; çîqa dilê min di\waze  
bo çê bikim lîstikan,  
ken têxim ser lêvên zarokan,  
hêstiran derxim ji çavên aşme nêzikan,  
lê qeram dikeve dilê min;  
işk dibin peyvok, nayên der  
û pênuş di destê min de nalive,  
dema tê bîra min :  
Mindalên me Kurdan  
nedikanin bi\wînin van nivîsan;  
jin û peyayên me  
nabînin van rûpelan.

Ronedîye dilo,  
de ezê ji kê re bi xwînim helbestan,  
bo kê tiji kim rûpelan ?!  
Ey welatê wenda,  
stana talihreşan,  
Kurdistan !  
Bêton kirin çavîyên çemê te  
bo kesk nebin dar û ber,  
vala bibin deşt û zozanên te  
... û bi milyonan peyvokên ronahîyê  
di dilên nivîskar û helbestvanên te de  
ber derkevin hatin fetisandin,  
bo şewqê nedin cîhanê.  
Li ser kaş û çiyayên te,  
di feyd û newalan de  
pêçîyan di çavên hev re dikin :  
Şeva reş didomîne ...  
û ew dîwarê ji perdeyên reş  
nahêle ku çirûskên bêjeyan  
tarîbûna şevan ron bikin.

1985

## B Ê H I Ş Î

Simo Peyakî giran e,  
Kulîlka odên gundan e.  
Simo peyakî bê tirs e,  
Lê mixabin, pîrr bê hiş e.  
Li gundê me, li der û doran,  
Simo diqîre wek şêran :  
"Ez egît im, ez fêde me,  
natirsim qe, ez boke me".  
Seb' hebek zad, bo berxekî,  
Yan gotinek nezane kî,  
Kureg, misas, ço û kevir  
rad'ke Simo dibe agir :  
"Lêxe, bikj', lawo her ser;  
werin gundîno, bikin şer".  
Gundîn me dibin du hêlan,  
li hev dixin bi ço û kêran;  
Ji bin lingan radibe talîzok;  
Li xwe dixin jin, digirîn zarok;  
Birîn dibin peya û xort,  
Dikevin xar cot li dû cot.  
Li erdê dirije ew xwûna sor,  
Canên wan dibin reş û mor;  
Hin dinalin wek segên kor,  
Pere tune herin tixtor.  
Li dû cîpekê radibe toz,  
Cendirme tên, bilind in poz.

Simo, yê berê boke bû,  
Nuha şermok, ved'şêre rû.  
Birîndar tên girtîgehan,  
Bo li wir jî werin lêdan;  
Kulav, dewar û zad difroşin,  
Bo ebûqat peran didin.  
Rezîl dibin, riswa dibin,  
Lê dîsa jî qe fêr nabin.  
Simo l' welatê me pîr in;  
Ta ew hebin. em nafirin.

1981

## EZ ÇI BÊJIM KAWA !!

Ez çi bêjim. ey bavê kal, ey Kawa yê Hesinkar !  
Gelê me ta roja îroj bi qîrîn û hawar.  
Tu pirs dikî. ger me stand serxwebûn û azadî !  
Bersîv na ye. bibûre tu; ez dikim şerm û fedî.

Welatê me hê bindest e, belav bûye l' vir û wir;  
Dijmin jî kevneperest e. şorên xwe derew û vir;  
Milletê me d'xewa kûr de, weqa lê bûye nifir;  
Ez çi bêjim, Kawa. bavo, dilşewat im pir û pir.

Tu pirs dikî, ger em yek in ! Na, Kawa şêrê Kurdan;  
Em û yeketî j' hev dûr in; em belengaz û nezan.  
Nokerên me jî hê pir in, ji bo neyar ser lingan;  
Eşîrên me jî namirin. li hev dixin wek bokan.

Kawa, bese j'min pirs meke; dilê min tiji agir;  
Derd û kulên min vemeke, me azadî wenda kir.  
Te rojek nû da gelê me, bi ronahî şev rakir,  
Belê şewqa zer û sipî di bin xwîna sor de mir.

Tu pirs dikî : serdest kîne ? Ew bêbext in, xwînê in;  
Rûreşên cîhanê ne ew, li ser piştê me dijin.  
Hêzên me jî wekî her dem, yek bi yê din re dijin;  
Şoreşgêr milan nadin hev, pêşmerge hev dikuvin.

Ey Kawa, pêşengê Kurdan, li welat şeve reş e;  
Merovê Kurd jî gêj bûye, di xewê de dimeşe.  
Belê mî dîsa jî namire. Kurdistanê nafroşe;  
Newroz waye carek din hat, ber dilên me zor \weş e.

Tu pirs dikî ji min Seyda : ger heye bo me hêvî !  
Azadî da\waza me ye, agir hê vêdikevê;  
Em çiq a ber \we didin jî, fersend dest me nakeve;  
Ne jî em dizanin çawa dawîyê bidin şevê.

Hêvîya dilan namire; megrî Mîrê Kurdistan;  
Hê hene l' ser kaş pêşmerge, bo gel fîda dîkin can;  
Hê bihar tîne Newrozê, ronahî dide çîyan;  
Hê tê bihîstin hin caran : yan Kurdistan yan neman.

Em li benda rojekê ne, têde bidin hev destan;  
Li hêvîya demekê ne, bibin wek \ûşk û biran;  
Nezanî ji nav me rabe, em bo hev vekin dilan;  
Ew dem dema ser\webûnê; bo ew roj bibim qurban.

III-84

E Y B I R A !

Ey bira ! Ey bira !

Ey birayê Kurdo, ez bi heyrane te;

Lo bira !

Ez dizanim tu mêr î;

Tu egîd î, camêr î;

Lo bira !

Lê çima, hawar çima,

bindest î, ne dikarî çêkî yeketî ?!

Lo pismam ! Lo pismam !

Lo kurmamo, ez bi heyrano, kur lawo;

Lo pismam !

Kurê Selahiddîn î:

Serbilind î, ez benî;

Lo pismam !

De çima, hawar çima;

Bona çi ez û te nag'hên hev pismam ?!

Ey Kurxal ! Ey kurxal !

Ey kurxalo, lawo ez bi heyrane te;

Lo kurxal !

Tu li serê min boke yî;

ez li serê te boke me;

Lo kurxal !

Lê neyar ? lê neyar ?

Ew yê har li dijî me herduyan e !

Ey hawar ! Ey hawar !  
Sedhezar car hawar ji derdê bindestî;  
Ey hawar !  
Xûşk û birano, de bes e;  
sedsala bîstan li paş e;  
Dê bes e !  
Gel rabûn, ro hilat;  
Têne em di şeva reş de dinalin !

1986



## HÊSTIRÊN REŞ

Nivîsarên xwe ji înglîzî jî min wergerandin kurdî,  
Helbestên bi alemanî,  
Çîrokên bi erebî jî,  
Û min peyman da xwe :  
Bi zimanê bapîran ez ê binivîsînim, bo yê n xwe.  
Di dil de hene hezar çavî,  
Dixwazin der bin,  
Lê li erdê reqî rût tune tiştekî bi avê were avdan.  
Di mêjî de hene babetên gulan,  
Lê hindik in yê n ji gulên rengîn fêhm dikin,  
Û hej dikin ji bîna wan.  
Hezar rûpel min îroj derxistin ji gorê,  
Rûpelên tiji bêjeyên jînê,  
Ku min bi saxî xistin gorê,  
Rûpelên bi bêjeyên zimanê bapîrên me dagirtî,  
Û ez bi ser wan de carek din giriyam,  
Û wek Kafka min jî dil kir wan bidim êgir :  
Ev rûpelên tiji peyvok,  
Peyvokên ronêdî,  
Bêjeyên tiji jana jiyînê,  
Ku kesek li wan xwedî derneket.  
Kî dizane ew çawa hatin afirandin,  
Çawa nivîskêr bo xatirê wan li xwe diherimand xewa  
şevan ?!  
Dijwar e, dijwar e, pirr û pirr dijwar,  
Dijwar e merov bibe nivîskar,  
Nivîskarê gellekî wek Kurdên bêpar.

Rûpelino !

Ez ê we dîsa tê\ime tirbê:

Dibe ku sibe kesek li we \wedî derkeve,

Kesekî ne ji kesên wek yên îroj.

Kesekî ji ewên dizanin çawa meya bêjeyên nemir tê  
vexwarin.

Lo, dilê min çiqê ji cîhanê maye,

Çiqê sar e van rojan,

Ku têde barana mirinê didomîne li ser Kurdan,

Ku têde berdewam e de\is û nezantiya me,

Bindestî,

Pêkenîn,

Û derew û derew. vir û \we \apandin.

Sar e dilê min. pirr sar,

Ji ber \asûk û fitekên me Kurdan, ...

Û car din ez geriyam li bersîva ew pirsê gran :

"KÎ NE EM ?"

Û ez dîsa li bersîva malşewitî geriyam,  
geriyam û geriyam.

Bersîva tirş û tahl;

Û min şkand pênuşa \we,

Bo nenivîsîne bersîva wê pirsê

Û pênuşa şkestî giriya :

Hêstirên reş rijandin ser kaxezê,

ku nixamtin şûna rêza bersîvê.

X-88

## LI BRÛKSEL

Di bin ronahiya çirayên bi şewq de,  
Di navbera dêr û koşkên kevnar de,  
Li binaniya ezmanê sayî,  
Destpêka biharê bû.  
Tev bi sedan kesên dilşa,  
Li dor maseyeke biçûk,  
Di êvareke şên de,  
Li Brûksel,  
Komeke ronakbîran cîh girtibûn,  
Kurd bûn li piçek şahî digeriyan;  
Û ez hatim pêşkêşkirin :  
"Ev e Şahîn,  
Şahînê nivîskar,  
Yê helbestvan.  
Şahînê rojnamevan  
û weşînekên radyo jî çêdike, ..."  
Hevalan dest drêj kirin,  
Kenên sivik li ser lêvan :  
Bi hest, yan bêyî hest,  
Ji dil, yan bi qerf,  
Bi dexs, yan dilşa;  
Min şerm kir,  
Ez keniyam,  
Lê di kûraniya dil de giriyam :  
Xweziya kerr û lal bûma,  
xweziya palîkî nezan bûma,  
Yan paqîşkerekî taxan  
Di welatê xwe yê rizgar de;  
Lo xweziya şewîtîbûna xwendegeha destpêkê !

1988

## EY DIJMIN

Ey dijmino, ey tirsoneko,  
Ey tu bêbexto, newêreko;  
Ger tu camêr î, de fermo were,  
Qama xwe rake, de fermo were,  
Lê tu hov î, tu ne merov î,  
li erdê cengê, tu weke rovî,  
Loma dikujî zar û zêçan,  
Jehrê dibarînî ji firrokan.

Ey neyaro, ey xwedan jehro,  
Ey zarokujo, tu xwûnmijo;  
Ger tu camêr î, de fermo were,  
Tifinga xwe rake, roja şer e,  
Lê tu dizanî pêşmerge bi hêz e,  
Leşker ji ber direve rêz bi rêze,  
Loma difroşî welatê bavan,  
pê dikirî jehr û axû û xazan.

Ey xwûnxwarê gelê mino,  
Ey tu dizê welatê mino;  
Ger tu mêrxas î, de fermo were,  
Em rabin hev, ka kî şer de,  
Lê tu hov î, xwûnê dimijî,  
Bombeyên jehrê waye davêjî;  
Hûn in xwedanên top û tankan,  
Yê me her evîn e bo Kurdistan.

Ey tu gelo, tu qehremano,  
Berxwedan domand bi salano;  
Ala te sor e, sipî. kesk. zer e,  
Roya Zerdeşt zer li navber e.  
Tu mêrvas î, Tu merovnas î,  
Li hember neyêr, boke-bê tirs î;  
Namîne bindest yê şer bike,  
Roja serbestî pirr nêzîk e.

IX-88

## LO MÎRO

Lo Mîro, Mîro. mîrê mîrano,  
Bi kerema xwe serê xwe rake ji gorê,  
Ji bajarê Şamê berê xwe bide Kurdistanê;  
Bibîne êş û janê.  
Li Helebçe, li Badînanê,  
Li Hekarî, Mehabad û Wanê,  
Bûne pergende li pêş çavên cîhanê.

Lo Mîro, Mîro. mîrê mîrano,  
Bi kerema xwe hespa xwe xar ke vê carê,  
Li welatê Kurdan jehr û axû dibarê;  
Neyar dîn bûye. har e,  
Ne zarokan, ne pîran dizane,  
Şewitand xakê Kurdane;  
Bajar û gundên me tune bûn, talan e.

Lo Mîro, Mîro, Selahiddîno,  
Bi kerema \we wîne bîra \we Hittînê,  
Xortên Kurdan berên \we dabûn mirinê,  
Canfida bûn bo Filistînê;  
Bo Musilmanên vê dunê,  
gelê me weqa da û hîn didê.  
Îro li me rabûye fermane,  
Ji welatên Musilmanan nayê dengekî dostane;  
Pirsa Kurdan li mezatê têye firotane.

Lo Mîro, Mîro. Selahiddîno,  
Bi kerema \we rabe binêr li meydanê,  
Li gelê te dîsa rabûye fermana nemanê,  
Axû berdane ser bajar û gundane.  
De hayê, hayê. hayê,  
De hayê li min rebenê \wedê, hayê,  
Xewa min li warê \urbetê nayê,  
De hayê, Selahiddînê Eyûb, hayê.

Bi dilê tiji agir bang dikime Kurdane,  
Lo Kurdino, hişyar bin, dîsa ferman e;  
Yan hûnê destan dirêj hev kin, yan nemane;  
Welatê we yek e, navê \we Kurdistan e :  
Yan hûnê rizgar kin, bibin \wedan nav û şan e,  
Yan jî berdeyam e zordariya van bêbextane.  
De hayê, hayê. hayê,  
De hayê li min rebenê \wedê, hayê,  
Xewa min li warê \urbetê nayê;  
De hayê, mîrê mîrano, hayê.

## KURD IM EZ

Kurd im ez, Kurd im ez, Kurd im ez  
Ez mame bi hezaran salan  
Ne Teymûrling, ne jî Cenkîzvan  
Nikaribûn min bikin neman  
Bo min berdewame jiyane.

Kurd im ez, Kurd im ez, Kurd im ez  
Serbilind, niştimanperwer im  
Ne Ataturk, ne Şahê Îran  
Nikaribûn qir bikin Kurdan  
Îro jî ala xwe radikim.

Kurd im ez, Kurd im ez, Kurd im ez  
Pirr dîtiye agir û sotin  
Li Mehebad, Agirî û Dêrsim  
Ne Evren, ne Numênî û Seddam  
Nikarin min ji rê wêde kin.

Kurd im ez, Kurd im ez, Kurd im ez  
Erê ez hin caran dikevim  
Lê dîsa û dîsa radibim  
Gel û welatê xwe bîr nakim  
Zû-dereng mafê xwe digirim.

Kurd im ez, Kurd im ez, Kurd im ez  
Bernadim rêçika niştiman  
Ger deh milyon jî cangor bidim  
Her hene pêşmêrgên qehreman  
Bang dikin her bijî Kurdistan.

Kurd im ez, Kurd im ez, Kurd im ez  
Dîroka min yeke kevnar e  
Hebûna min tev jan û ar e  
Dizanim sibe roja min tê  
Serxwebûn û dilşadî wê bîn.

IX-88



## VEGERN

Ey milletê min  
Ey gelê min  
Vegerin vegerin vegerin  
Hûn kude diçin  
Pirr dirêj mekin  
Rojekê dîsa vegerin.

Ez Kurdistan im  
Warê Mîdyan im  
Namirim namirim namirim  
Pênc hezar sal in  
Dayka Kurdan im  
Rojekê dîsa radibim.

Ey lawên Kawa  
Ey keçên Mîdya  
Vegerin vegerin vegerin  
Rê wenda mekin  
Min ji bîr mekin  
Ez nebim hûn jî ne kes in,

Ez perîşan im  
Li bin destan im  
Neyaran laşê min qut kirin  
Lê hê jî sax im  
Her bi daxwaz im  
Dilê xwe bo we şa dikim,

Jîn ya fêdan e  
Welat îman e  
Bîr mekin bîr mekin bîr mekin  
Bê xebat mejîn  
Bê hêvî memîn'  
Roya zer dîsa ê hilê.

IX-88

Z Î N Ê

Amed bi ser Dicle de giriya bi herdu çavane,  
Got, li minê, çi şermeke mezin e giran e,  
Li başûrê welêt xelkê me bûye perîşane,  
Digerine li warekî bo lê bibin mêvane.  
Feleka xayinê, çi şermeke mezin e giran e,  
Li şûna biran serdest bûye mazûbane,  
Mêvan rast kirine çadir û konane,  
Li dorhêlan leşker bi tifing û singuyane.

Dereng e, ro razaye, nivê şevê ye;  
Ji binê konekî qîrîna Zînê têye,  
Zîna neh salîn ji birînan xew nêye.  
Dayik bang kir : Zînê, ciwanê, ez bi gorî,  
Te kezeba min kewand, keçê lorî-lorî.  
Zînê got, lê dayê, Zîn bi heyranê,  
Qîrîn şerm e, dizanim, lê birînen mine xeddar in,  
Agir û janê bedena min rebena xwedê helandin.

Li dora çadirê civiyabû komeke jin û peyane,  
Merovên serbilind stûvar li vir dimane;  
Qîrîna Zînê agir berdabû cîgera wane,  
Ne mabû xewa çavan, ne şahîya dilane.  
Pîrekê bang kir : Xwedê, jînê li hovan bike qetrane;  
Zarokên me kirine mirî û birîndarên bombane,  
Warên bapîran li me kirine dojeh û zindane,  
Em ji welêt sirgûn, bûne koçerên cîhane.

Kalekî bang kir : hûnê şîreta min bidine keç û xortane;  
Bes e xapandina salan, bila êdî fêr bibin dersane,  
Biratiya bêbextan hemî pêkenîn û talan e,  
Li cîhanê kesek nabe hevalên bindestane.  
Bona xatirê Zîna neh salîn, ku nuha dike sikrane,  
Bona xatirê zerî û esmerên me Kurdane,  
Ku îroj berên xwe dane çol û kerbelane;  
Bila hişyar bin, têkevin rêçika serxwebûna Kurdistane.

Berbang e, berbanga rojeke îlona heyştê û heyştane;  
Cinazê Zîna çeleng radikine gorane;  
Şîna reş xwe berdaye ser konên muhacirane;  
keçeke neh salîn xwe gîhandiye refên cangorane;  
Erê, Zînê jî bo xatirê gel û welatê xwe bûye qurbane.  
Dayika Zînê bang kir : Hûnê dawiyê bidine hêsrane,  
Hûnê xwedî kin zarokên li ber şîrê dayane,  
Bila hilînin heyfa şehîdên Kurd û Kurdistane.

IX-88

## NIZA'M ÇIMA

Cîhan pîrê şên û şêrîn e, weqa narîn e;  
Kaş û derya, çem û newal wê dixemlînin;  
Niza'm çima li hin deran her girî û şîn e,  
Her girî û şîn e, her girî û şîn e, lê dayê,  
Tum girî û şîn e.

Merov gihîştîye hîvê, jê derbas bûye;  
Li hin şûnan lawir azad, xweşî û şahî ye;  
Niza'm çima l' hin welatan jîn bê hêvî ye,  
Jîn bê hêvî ye, jîn bê hêvî ye, lê dayê,  
Jîn bê hêvî ye.

Hin netewe bi hezaran, xwedan dewlet in;  
Hin jî jimar bi milyonan, îroj bindest in;  
Niza'm çima hin rabûn jor, hin jî tum ketin,  
Hin jî tum ketin, hin jî tum ketin, lê dayê,  
Hin jî tum ketin.

Cîhana me difertile, dem û dewran e;  
Hin kesên wê pêşve diçin, hin jî razane;  
Ey gelê min, neyar hovv e, rê yeketî ye,  
Rê zanistî ye, rê yeketî ye, gelê min,  
Rê zanistî ye.

IX-88

## BIHARA 88an

Bihar li pêş e, gotine Simko,  
ji dengê tavan metirse,  
ne ji tîrêjên brûskan,  
dû wan baran dibare  
û kulîlkên rengîn tên der,  
bêhna xweş belav dikin.  
Bihar li pêş e, Simko, bihar !  
Û bihar hat :  
dengê firrokên cengê,  
tîrêjên bombeyên mirinê,  
barana guleyên mîtralyozan,  
li şûna kulîlkan dûyê gewr rabû  
û bêhna çekên kîmawî belav kir.  
Simko bêhn kir û mir.  
Bihar bû,  
bihara mirinê,  
bihara 88an. 1988

## XWENDIN

Bixwêne !  
Çi bixwênim ?  
Pirtûka han.  
Li ser çi ye ?  
Li ser welatê me.  
Naxwazim.  
Kuro, min got bixwên !  
Ne bi zimanê min e.  
Bixwêne, lawê keran, yan, ..  
Ez ê bixwênim,  
lê ne ji dil.

1988

## LI BERGEN

Li serê çıyan berf diheliya,  
dibû av û avê \we di rêçikekê de  
bi hêz berdida newalê;  
û rêçik ji serên kaşan bêtir dibûn,  
ji hemıyan dihat ava zelal.  
Di newaleke kûr de çemên biçûk dicivıyan,  
dibûn çemekî mezin  
û' ew çemê mezin raste çemên din dihat,  
hemî tev dibûn goleke ava hêşın.  
Wek buhuştê bû ew der, ger hebe buhuşt,  
av û dar û berf û çıya  
û li jor ro dikenıya.  
Ji vir ne dûr hebû bajarek,  
di nav çıyan de li ser derya :  
Bergen.  
Di qehweyeke bajarê xweşik de  
pîrekê ji min pirsî :  
tu ji ku têye vir ?  
Ji Sydney.  
Tu li wir hatî dunê ?  
Na.  
Li ku ?  
Li Kurdistan.  
Çıma neçûyî wir ?  
Qedexe ye.  
Çawa qedexe ye ?  
Wek çûna Brecht û Mann bo Alemanyaya nazî, hê bêtir.  
Biborîn, gote min pîrê,  
biborîn, min di dilê te de ew hesta rakir.

1988

## VEREŞANDIN

Ji çanda hemî gelan hej dikim,  
lê ya gelê min bêtir li xweşiya dil tê  
û dixwazim zaroyên min bi wê rabin,  
lê :

COCA COLA,

RAMBO,

DISCO,

MICHEL JACKSON,

20.000 KÎLOMETIR DÛRBÛN

û hezar tişt û pirs û merseleyên din  
dibin dîwar.

Ez baş dizanim,

zû dereng em ê ji hev biqetin,

tenê di nav çanda zarokiya \we de

ez ê bi ser \we de vereşim.

1988

## RÛREŞÎ

Çûm civîna rûreşan,  
di daristaneke şewitî de  
û pirsî ji çendekan :  
Tu çima rûreş î ?  
Min heyfa bavê xwe hilnanî.  
Lê tu ?  
Xûşka min reviya.  
Lê tu ?  
Di odê de ba ji ber min çû.  
Lê tu ?  
Cîranê min li ber jina min li min xist.  
Lê tu ?  
Min gayê xwe bi cûzê derda.  
Lê tu ?  
Inbarçî me.  
Û hemiyar :  
Lê tu ?  
Ji şerma venegerandina welêt.  
Ji me bi çend gavan wêde  
kalekî rûsipî bang kir :  
Û EV HEMÎ RÛREŞIYA BINDESTÛNA WE YE.

1988



## MUHACIR

Tu muhacir î ?

Na, şoreşgêr im.

Çima ji wir hatî ?

Ji dest zolm û zorê,

bo xatirê zaroyan jî.

Çima ji vir ne razî yî ?

Dilşadî neda min,

û bo zaroyan jî.

Û veger kengê ye ?

Li benda demoqrasî me.

Demoqrasî ?!

Di derya mirî de kengê pirr bûn masî,

li Rohilata Navîn jî tê demoqrasî.

1988

## SERXWEŞ

Çima weqa vedixwî ?

Min pirsî ji bêwarekî binaniya taxê.

Ken biha bûye rêwîyo

û çi ji te re, çima dipirsî ?

Dilê min dişewite bi te.

Rêwîyo,

ger dilê te rast bişewite,

tu jî ê vexwî wek min.

Biçe bi rêya xwe de,

bi derdê yekî nizane kesek wek xwediyê wî,

EZ BI MEYA ARZAN DIKIRIM PIÇEK ŞAHIYA BIHA.

Lê yeke derewîn e, min gotê.

Şahiya derewîn çêtire ji bêşahiyê.

Û ez çûm di riya xwe de,

bi dilekî xemgîn;

serxweş dikeniya.

1988

H A W A R !

Hawar, hawar, hawar !

Kuro lawo, dixwazim biqîrim û bang kim

Ey Kurdekan,

lo min dil heye bangî gel kim,

lê bi çi zimanî,

bi çi zaravê,

bi kîjan elifbayê

û

di rojnameya kê de ?

Hawar, gelo. hawar !

Miçiqî bîra sebrê, hişk bû dar.

De qîrîn û hawara min,

ew ê çawa xwe bigihînin guhên we ?

Di radyoya kê de ?

Bêjeyên min ê çawa derbase çavên we bin ?

Di kovar û rojnameyên kê de ?!

Û

li ku ne ewên dixwênin ?

Hawar xortino, hawar !

Lo em xapandin gotar û belavokên arzan;

lo ez sond dixwim bi Yezdan,

sond dixwim bi şeref û namûsa Kurdan,

bi şîrê dayan.

ez sond di\wim bi nefsa şikestî ya qehpeyên şevan  
ku xwe dikişînine li Abû Dabî, hatine ji Kurdistan,  
em xapandin, em xapandin wan "mamostan".

Hawar keçino, hawar !

Lo xelkê mino, bawer mekin rûpelên "rojnaman",  
ku dikine ji we re piştgirtina gelan;  
bawer mekin wan "rojnaman",  
ku dikine ji we re behsa civîn û meşan.

Ez sond di\wim bi royê, bi hîv û stêrkan :

Ger bîst milyon Kurd werin şewitandin,

werin avêtin,

werin sotin,

werin birajtin,

werin xwarin,

tune bo we piştgirtina gelan,

ne ya karkeran,

ne ya netewan,

ne ya welatan.

lo, we nas nakin ji sedî nod û neh merovên cîhan.

Em xapandin, em xapandin,

em xapandin wan bextereş û bêçaran

û hê jî berdewame xapandina şorên arzan.

Sond dixwim bi Hurmuz û Ehreman,  
ne welatekî sor,  
ne yekî sipî,  
ne yekî reş,  
ne yekî demoqrat û ne jî musulman  
xem kişand dema Helebçe û goristan,  
dema fetisandin zerî û esmerên Kurdistan,  
dema kujtin pîr û kal  
û bêcan hîştin çelrojkiyên hembêza dayan.  
Sond dixwim bi rêya Zerdeşt :  
ta gelê Kurd hişyar nebe,  
ta Kurdekan nebin yekdest  
û ta nezan û derewîn bibin mamoste û nivîskar  
niye bo me jiyaneke serdest û hêsan,  
niye bo me hêvî, canekem,  
hîwa niye, ez bi heyran.  
Hawar gelo, lo hawar û hawar !  
Xwedê razaye,  
merovtî nemaye,  
Kurd li pê hemiya ye  
û rojname û belavokên me, ...  
Li hêlekê navên mezin û drêj,  
Li hêlekê nifşê nû jî bûye gêj  
û  
bi navê " gelê me" têt axaftin !  
Lo hawar gelo, hawar !  
Hawar, "gelê me", hawar !

Lo bigere li şivanan,  
lo êdî talan bûye dewar, talan.  
Şivanên ku bi zimanê dewêr bizanibin  
û jê re lêxistin bilorê,  
li şûna kasêtên biyanî.  
Ey xûşk û braderan, ey gelê Kurdistan !  
Ger ji bîst milyonan xwend ev helbesta bîstan,  
bila bi xêra hestiyên miriyên we be,  
belav bikin ev hawar û banga reş :  
Pezekî kevnar û gewre ji pezan  
wenda bûye, gur li hemî hêlan.  
Şivanên şîrhelal û zana divên bo wan,  
ku hez bikin ji dewarê xwe,  
ne bavêjin wan kevir û kuçan.  
Şivanên bizin û miyan,  
ne yên mirîşkan,  
ne yên hespan,  
ne jî nêçîrvanên piling û şêran.

1988

## HESRETA DIL

Li cîhanê têr geriyam,  
dîtîm bajar û gund,  
çiya, newal û derya,  
derên paqîş û çeleng,  
lê heku fersendê dibînim,  
di kûraniya şevan de,  
di quncikekî xaniyan de  
xwe vedişêrim  
û li ser Mezrê digirîm,  
deştê Sirûcê û Kobanî.  
Ez li pîrr merovan rast hatim,  
çê û xirab,  
zana û nezan,  
lê herdem, roj bi roj bêtir  
bîra gelê xwe dikim.  
Di civatên şên de rûniştîm,  
li şûnên xweş û fireh,  
lê bêhna titûna arzan  
di odayên gundan de  
tum û tum ber bi xwe dikişînin min.  
Her şev ji bajarekî dûr  
xwe li welêt digirim  
û ji ser derya gewre re difirim  
bo xwe bigihînim nav rezan,  
nav zeviyên gênim  
û mitên zebeşan;  
diçim warên hilweşiyayî,

diçim goristanên mezin,  
 diçim Kurdistan.  
 Dizanîm welatê min li paş e,  
 bi gelş û diwartiyên bindestiyê,  
 bi dijmintiya nav gelê xwe,  
 lê xewna vegeerê naçe ji bîr  
 û agirê hestên di dil de  
 sal bi sal şêntir û gurrtir dibe.  
 Diniherim li herdu zaroyên xwe :  
 dilşa ne di welatê nû de,  
 li vir bûn û vwedî bûn  
 û ez bi xwe de grêdam wan,  
 ew jî bernadin.  
 Îşev cara yekem bû di jiyana wan de  
 ku hêstir dîtin di çavên bavê xwe de.  
 Ew û dayika wan  
 serên xwe kirin ber xwe  
 û bi keserên kûr çûn,  
 çûn odeyeke din.  
 Me hemîyan baş dizanibû  
 tiştê ne di cîh de ye  
 û ew tiştê ez bûm,  
 ezê ji gel û welatê xwe dûr.  
 Ne xweşbûna welatên din,  
 ne şahiya li verîbiyê,  
 ne jî nêzîkbûna me çaran,  
 tiştê nikare vemirîne vî agirî.  
 Û bavê min tete bîra min :  
 Beri li bakur, li Soregê,



çav tiji hêstir digot,  
ax li min welato, te çi li min kir !  
Çiqa dixwazim vegerim  
li gel û welatê xwe;  
kî dikare karekî bo min peyda ke,  
çi dibe bila ew be,  
di beşekî azad di welêt de,  
bi nanezikê be jî;  
lo xeberê zû bigihînin,  
dixwazim vegerim li welêt  
û bêhna titûna arzan têxim bêvilên xwe,  
guh bidim şora civata odan,  
pîr û kalên me  
û dengê lîztikên zarokan.

1988

## DIGERIM LI BÎREKÊ

Digerim li partîkî  
min fêrke elifbayê;  
bêje ji min re çima  
cîhan kerr e deng nayê.  
Digerim li hêzekê  
li min xwedî derkeve;  
bêje çima li paş im,  
dawiya şevê nayê.  
Digerim li kesekî  
şora rast bo min bêje,  
bibêje çima em Kurd  
ser li me hê jî gêj e.  
Digerim li xocekî  
min fêrî dîrokê ke;  
li odeya gundê me  
sorê bi Kurdî bike.  
Gotinbêjan gote min :  
partî hene bi dehan,  
navê Lenin bang dikin,  
hemî "agir û pêt in".  
Min jî gotê ey bira,  
çima ew qe nayên vir ?  
Ez hê niza'm bixwênim,  
de çiza'm Lenin çi kir ?  
Bo min divêt yek rêber,  
bibêje ka ez kî me,  
çima mame bê heval,  
nakenim tum digrîme ?  
Digerim li bîrekê  
jê bik'şînim ava sar,  
dilê min honik bike,  
serê min bike hişyar.

1988

NEWROZ '89

Bihar hate serê çîyan,  
kaş xemilîn hemî b' gulan,  
lê şa nebûn, tev de giriyan;  
zozan vala bû bû j' \wed'yan.

Cejna bêxwedî sêw'yanê !  
Newroza heyştê û nehanê,  
Çawa ez bigrim dîlanê ?  
Şîn daniye Kurdistanê !

Hovê mar seri hildaye,  
arê mirinê dadaye,  
jiyan kiriye qedexe;  
Helebçe reş girêdaye.

Lo Kurdo \we bihejîne,  
nezantiyê j' \we derîne;  
bona xatirê cangoran  
rêya rast êdî bibîne.

Kurd yek e, yek Kurdistan e,  
dem ya pakhûna dilan e;  
wek destekî têbikoşin :  
Yeketiya me jiyan e.

Sond dixwim bi serên ewan :  
Ew cangorên heyştê û heyştan;  
ew penaberên perîşan :  
Ê rizgar bibe Kurdistan !

1989

## BERXWEDANA GIRTIYÊN ME

Berxwedana girtiyên me didomîne  
Berxwedana girtiyên me têkoşîne  
Li Diyarbekira xopan  
Li bajarên Kurdistan  
Berxwedana bokeyan didomîne.

Lê dîrokê de binivîsîne navan  
Dogan û Mezinkaya û hevalan  
Cangorî bûn bo jiyane  
Bona Kurd û Kurdistanê  
Berxwedana bokeyan didomîne.

Berxwedan bo azadiyê didomîne  
Berxwedana li zindanan têkoşîne  
Mehdî Zana û hevalan  
Serbilind mane bi salan  
Berxwedana bokeyan didomîne.

Ey cîhanê dayikên me tu bibîne  
Bo jiyane çawa dişewitînin  
Cîhanê bibîne Kurdan  
Têkoşîna li Kurdistan  
Salha Şener, Rehîma Şahîn bibîne.

Bang dikim gelên cîhanê : Me bibînin  
Netewa Kurd bi tevahî dilbirîn e  
Em birçiyên azadî ne  
Jiyana me têkoşîne  
Em li benda piştgirtina we dimînin.

## ZAROKÊ JI HELEBÇE

Zarokê bênav !

Bênav dibêjim,

lê hene hezar û yek navên te,

ku min fedîkar derdixin,

ne wek Kurdekî,

bêtir wek merovekî.

Çavên te yên reş-belek

ji bîra min naçin.

Di şanzdeyê adara heştê û heştan de :

Te can da,

lê vekirî man çavên te,

ew çavên te yên reş-belek

vekirî man li dû mirinê

û niherîn li ezmên :

Royê û stêrkan şerm kirin,

lê ne cîhana me.

Zarokê ji Helebçe !

Adareke din waye hat

û ro hê li jor e,

dihere û tê,

lê nema êdî roya berê ye :

Bi mirina te re tiştê ji wê kêmbû

û ji me hemiyan.

lê cîhan her wisa ma :

Bêşerm û wujdan.

Ji bîra min narin çavên te yên reş-belek :

Di mêjiyê min de dijîn çavên te,

di dilê min de diqîrin çavên te,  
merovtiya min dihejînin çavên te,  
kurdûna min dikemilînin çavên te  
û di ev rojên bo me sar û tarî de  
hebûna min diparêzin çavên te.

Zarokê bênav !

Wêneya te belav bû li cîhanê,  
hêstir barandin ji hindêk çavan,  
hindêk pîrr weyidandin,  
lê zû jî tu ji bîr rakirin hinan :  
Tu bûyî wêneyeke di rûpelên rojnaman de  
û ketî arşîvan,

lê bo Kurdistan  
tu bûyî rûpeleke dîroka reş,  
dîroka hebûna me :

Hebûna bi hêstir,  
hebûna bi xwûn,  
hebûna tiji rojên tarî,  
lê ew hêstiran in.  
ew xwûna ye,  
ew tarîbûna rojan e,  
ku netewa me avis dîkin  
û jiyana car din dizê :  
Can dikeve têkoşînê  
û gurr dibe agirê kurdayetiyê.

Zarokê bênav !

Bila çira venemiriyabûya di çavên te yên reş-belek de,  
li şûnê birijiyana herdu çavên min;  
bila jiyana te nequrçifiyabûya di destpêka biharê de,

li şûnê agir pêketa bedenên me hinan,  
lê, çavreşo, "ba nayê li gor daxwaza dilên keştîvanan";  
û wek ava çêm roj û şev jî derbas dibin  
û em jî di nav de,  
rûreşiya me jî tev me,  
lê çavên te ê me bigihînin hev  
û bi ronahiya wan nifşên têyên ê pêş xwe bibînin.  
Di ezmanê welêt de stêrkên nû ê hilên,  
da nehêlin şevreşiyê.  
Erê, çavreşê min, erê !  
Tu yek ji wan stêrkan î.

1988

## PENABERÊ WENDA

Ha wa ye hê hatiye  
Kampa penaberan diye;  
wer dizane azad bûye,  
warekî nû bo xwe diye.  
Ax, penaberê wenda, ax !

Roj baş çavim, roj baş kaka,  
li ser serim tu hatiye;  
E min jî wekî to kurd im;  
bêje, li welat çi heye ?  
Bêje, li welat çi heye ?

Nîvşermok, seri li var e,  
bersîv tê ji dilê sar e,  
Dibê, bapîrên wî kurd bûn,  
lê belam ew îranî ye.  
Ax, penaberê wenda, ax !

Dibê, kurdî baş nizane,  
farisî xêlexop zane;  
dilê wî ne bo Kurdan e,  
amanca wî tev cîhan e.  
Ax, welatê sêwîyan, ax !



Ewê han jî penaber e,  
bi navê Kurdan hatiye;  
tenbûra xwe lêdixîne,  
bi tirkî jî dilorîne.  
Ax, penaberê wenda, ax !

Roj baş bira, roj baş kekê;  
tu li vêderê çi dikê ?  
Li ser ser û çavan hatî,  
hele bêje, tu ji ku tê ?  
Ax, penaberê wenda, ax !

Xort virde-wêde dinêre;  
dibê : "arqadaş merheba;  
evet, babam-anam Kurd e,  
lê 'turklemîş" bûne tevde".  
Ax, penaberê wenda, ax !

Ax li mino, lo welato,  
ev çi bû l' serê me hato;  
tu heyî, lê dewlet niye,  
av pirr e, lê dewar tî ye.  
Ax, welatê sêwiyar, ax !

II-89

## NAVEROK

Pêşgotin	3
Jana heft salan	6
Bang	8
Hevalê	9
Qîrîna me	11
Welatê me ye Kurdistan	12
Dayka ronedî	14
Evîna kevin	15
Kampa nav qûmê	15
Kenê li ser bîrê	17
Bihara gundê me	18
Delalê-Xanimê	20
Kujtina Qamişlokê	21
Reyber	23
Jina kurd !	25
Cotkar !	25
Jîyîna gund	26
Bûka Mîdîyan	28
Kulîlka zer !	30
Gustîrka bê xwedî	31
Merovtiya me	32
Karkera nijadperest	34
Mebest yek e	36
Dîrokê bibe şahde !	38
Çima ?	40
Çê !	44

Ey Ehreman !	47
Qeralê pêrîyan	49
Li xerîbîyê	51
Ax ji derdê van bêbextan	52
Keça kurd	54
Gotina rast	55
Yeketiya gelekî	55
Zarok û stêrka rijiyayî	60
Jîyana jineke kurd	61
Wêneguhêz	64
Balafir	65
Em	66
"Lo Kurdino" !	68
Kobanî	71
Dayê	72
Bokeyê gel	74
Govenda netewa kurd	75
Ku de çûn ?	76
Zor spas Stockholm	77
Dengên ji dûr	80
Jin	82
Yan Kurdistan, yan neman !	83
Veger	84
Kulîlka dawîya zivistanê	85
Pelika zer	86
Xwendina bi kurdî	89
Newroz	90
Ey şehîdan	91
Xwezîya ez mûrîyek ba ma !	93

Bo xortên girtîgeha Diyarbekir	95
Stirana masiyan	96
Govenda Newrozê	97
Mizgîn ne hat	99
Bênav	100
Megirî	102
Li sirgûnîyê	103
Lawek ji Asra	104
Deng	106
Dûrbûna ji welêt	107
Stirana keçika li xerîbîyê	107
Çiya û çem	108
Zordar nabe dost	109
Çûyîna Aleman	110
Ji kê re ?!	111
Bêhişî	113
Ez çi bêjim Kawa !!	115
Ey bira !	117
Hêstirên reş	119
Li Brûksel	121
Ey dijmin	122
Lo Mîro	123
Kurd im ez	125
Vegerin	127
Zînê	128
Niza'm çima	130
Bihara 88an	131
Li Bergen	132
Vereşandin	133

Rûreşî	134
Muhacir	135
Serxweş	136
Hawar !	137
Hesreta dil	141
Digerim li bîrekê	144
Newroz '89	145
Berxwedana girtiyên me	146
Zarokê ji Helebçe	147
Penaberê wenda	150

**Weşanên din ên Enstituyê :**

- Bultena sênehî ya agahdariyê, N° 1 - 4, bi çar zimanan :  
Kurdî, fransî, hollandî, ingilîzî.
- CEMIL PAŞA Ekrem, Muhtasar hayatım, bi tirkî.
- Dossier Kurdistan, bi fransî.
- Dossier Koerdistan, bi hollandî.
- The Kurdistan File, bi ingilîzî.

**ŞAHÎNÊ BEKIRÊ SOREKLÎ** di 1946 de, li gundê Mezrê, li Kurdistanana Sûriyê ji diya xwe bûye. Bavê wî ji Kurdên dumilî bû û ji Sêwregê, Kurdistanana Tirkîyê, hati bû vî beşê welêt. Şahîn li bajarê Kobanî dest bi xwendinê kir û di dawîya sala 1965 de li bajarê Helebê xwendina lîsê kutah kir. Di eynî salê de ew ji bo xwendinê çû Ewropayê û heta dawîya sala 1968 li Otrîş û Almanyanê ma. Di Çîriya 68 de wî ji sedemên aborî û yê nî din xwendina li zanîngeha Mûnşin hişt û li bajarê Sydney, Awîstralya, bi cî bû. Li wê derê, ew dest bi kar dike û di sala 1971 de bi keçeke awîstralî re dizewice. Di destpêka sala 1974 de ew cardin vedigere zanîngehê û piştî xwendina çar salan ji zanîngeha MACQUARIE ya SYDNEY şêhadetên BACHELOR OF ARTS (zimanên almanî û îngilîzî, felsefe û polîtîk) û DIPLOMA OF EDUCATION (Pêdagojîk) distîne.

Ji sala 1978 heta nuha Şahîn ji Wezareta Fêrkirinê ya wilayeta NSW re weka şîretvan û mamosteyê zimanan kar dike. Ew îroj di lîseyeke bajarê Sydney de mamoste ye.

Di dawîya sala 1979 de, li bajarê Sydney komeleya kurdî ya yekem li Awîstralyanê tê damezrandin. Heta sala 1984 Şahîn sereketiya wê komelê dike. Di salên 1982 û 83 de, ew 18 mehan bernameyê radyo di heftê de carekê, di dezgeheke FM de, bi zimanên kurdî û' îngilîzî pêşkêş dike. Ji dema destpêkirina bernameya bi zimanê kurdî di dezgeha radyo ya ji bo komên etnîk de (Îlon 85) ew berpirsiyarê vê bernamê ye. Bernamêya bi zimanê kurdî li ser pêla navîn, di heftê de niv saetekê, di Radio 2 EA ya SPECIAL BROADCASTING SERVICE de, li Sydney tê pêşkêş kirin.

Ji nivîsarên Şahînê Bekirê Soreklî ev pirtûk hatine weşandin : Azadbûna Mehmet Karataş (kurteroman), Enstituya Kurdî, Bonn, 1985; Wendabûn (roman), Verlag für Kultur und Wissenschaft, Bonn, 1987; Em û pîrsa me (gotarên siyasî û yê nî li ser zimên), Sydney, 1987; Mehkemekirina Selahiddînê Evûbî (şano), Haykurd, Stokholm, 1989. Heta nuha jimareke ne piçûk ji gotar, helbest û çîrokên wî di rojname û kovarên kurdî de hatine weşandin. Gelek nivîsarên wî hîn ne hatine çap kirin. Di nav wan de roman û çîrokên ku ji zimanên almanî û îngilîzî hatine wergerandin jî hene. Şahîn herweha gotarên edebî, siyasî û pêdagojîk bi zimanên îngilîzî û erebî nivîsandine. Helbest û kurteçîrokine wî bi wan zimanan û bi zimanê almanî di kovar û rojnameyan de hatine weşandin.

Di van salên dawîn de, Şahîn ji aliyê naverok û awayê helbest û berhemên xwe yê nî din de gelek pêş ve çûye. Ew ji çarçeva klassîk derketiye û bi awakî gelek nûjen hestên xwe yê nî kûr û geş li ser kaxiz dirîjîne.